

## Zilamtiya jehrîn

Gotina 'zilamtiya jehrîn' (zilamtiya toksîk) peyvek e ku vê tehma zingariyê pênase dike. Ev gotin destpêkê di salên 1980-90'î de ji bo pênasekirina mêrên ku li keviya civakê mane hat bikaranîn... ***Munewer Azîzoglu Bazan / R.2***



## Konê bêderî

Ez zarok bûm, na, na ez ne zarok bûm, hema pêda pêda ber bi temenê qîzekî xama ve diçûm. Malbata diya min hemû jî bajarî bûn, ne wek me koçer bûn. Ew di xaniyên mezin de dijiyan û li der û doran wan heywan tune bûn... ***Kewê Redkan /R.11***



## Strana serdema xwe

Strana Lêkir di salên 1980-88'an dema ku li başûrê Kurdistanê siyaseta Ta'rîb û Enfalê hebû hatiye gotin ku peyamên tije hêvî di nava xelkê da belav dike. Çend tabloyên wê stranê hene ku tije xwezî, daxwaz û hêviyên mezin e... ***Kakşar Oremar / R.12***

# xwebûn

31 GULAN-6 HEZÎRAN 2021 HEJMAR: 76 BUHA: 5 TL rojname@xwebun.org

# Mikurhatin ne sedem encam e

Çeteyê girêdayî dewletê Sedat Peker ev demek e li xwe mikûr tê. An jî bi gotineke din sûcên dewleta tirk vedibêje. Li ser nîqaşên Peker û faşîzmê gelek senaryo tên gotin. Îfşatên Peker ne destpêk û sedem lê encamek e. Encama têkçûna pergala faşîzmê ye. Peker û gotinên wî di encama têkçûyîna Erdogan de derketin holê... ***H. Halît Alaçatî / R.6***



### Tûrikê Dedo bîra me ye!

*Ew kalê 83'ê salî temenê zarokatiya me ye. Ew 25 salên li girtîgehê ji hezarî yek beşek ji dîlitiya me ye. Kelemçeya li ser zendên wî bi sedsalane fermana kuştina me ye. Bi êşa dil ketiye Mehmet Emîn Ozkan. Ew êşa dilê civaka me ye. Divê em ji bîr nekin. Tiştên di tûrikê Dedo de ji bîr kirin, xayîntiya li hember hebûn û xwebûna me ye...* ***Reyhan Îke / R.3***

## Şerê arizî û pergalê Tirkîya

Rojeva ma nê deman de serobin bîya. Yew hewteyo ma televîzyonan de medyaya sosyale de rojnameyan de kure ra bewnê qala mesajanê Sedat Pekerî beno. Ma zî kewtî na gindale mîyan û şonê. Na meseleya sîyasetî ya. Cayo ke merdim nêeşko rojeva xo awan bikero sewbîna hêzî rojeva to bewlî kenê. Tirkîya de yew hewte, des rojî yo ke ma nê halî de yê. Sîyaset, komel rojeva Pekerî dima şonê. Her kes tira çîyêk paweno. Na mesela ajandaya her kesî sewna ya. Hima her kes paweno. Se beno, çi beno ser fikirîyeno. Ge-ge no çi tofono vanê, ge-ge zî vanê na operasyon ra pey beno ke tay çîyê rindî bibê. Hima mesela rașta no hewa ya? Hêzê ke na mesela ser şîrove kenê, rojeva şarî ra zaf dûrî yê. Çina ra? Hima vîdeoyanê Pekerî ra teber çi orte de çînîyo. Ma ewnîyênê tay rojnameyan; 'Komelo pank' ra behs kenê... ***Murad Tunekragij / R.9***

## Dê ji mirovbûnê dernekevin!


Dijminahiya jinan bi 'jinan' didin kirin. Belê di van rojên dawî de careke din bûyereke sosret kete rojeva jinan. Jina ku weke wezîra malbatê hatiye erkdarkirin jî di navenda vê bûyerê de cih digire. Wezîra Xizmetên Malbat û Civakê Derya Yanik di Komîsyona Lêkolînê ya diyarkirina sedemên tundiya li dijî jinan de li meclisê daxuyaniyek da. Di vê daxuyaniyê de got; 'Di pêvajoya pandemiyê de çav li zêdebûna tundiya li dijî jinan dikare bê girtin.' Bê guman ev peyam bû sedema nerazîbûnên jinan. Nerazîbûnên jinan dikare bê fêmkirin, ev peyam divê bi vî rengî bê nirxandin ku wek pehîneke têkoşî... ***Eylem Şoreş / R.2***

## Di perwerdeyê de derew

Armanca hemû dêûbavan ew e ku zarokên xwe bi kesayetiyeke pak û serbilind, zana û bixwebawer perwerde bikin. Zarokên wan di jiyana xwe de her serkeftî, xwedî pêşeyeke payebilind, karekî baş û bextewar bin. Di nav heval û civaka xwe de mirovên qedirşînas û serbilind bin. Berpirsiyariyên dêûbavan yek jê jî ev e ku ew bi xwe ji zarokên xwe re bibin rêber û nimûneyeke baş. Bi helwest û pratika xwe dirustî û rastiyê nîşanî zarokên xwe bidin û baweriyê bidin wan. Rê, şans û derfetan ji bo zarokên xwe pêk bînin, kêmasî û şaşiyên xwe sererast bikin. Dersên erênî bi dest bixin... ***Amed Tigrîs / R.5***

## Govend û stranên xurfanî

Li rojavayê Kurdistanê berhema bi navê stran û govenda Xurfanî tê amadekirin. Ji bo ku em agahiyên berfireh werbigirin, em bi Endamê Tevgera Mezopotamyayê ya Çand û Hunera Demokratîk a Rojavayê Kurdistanê – Beşa Stran û Muzîkê Bêkes Darî re axivîn. Darî di axaftina xwe de dest nîşan kir ku herêma Cizîrê ji aliyê çand, ziman û kelepûran gelan ve gelekî dewlemend e û wiha axivî: "Bi taybetî jî rengek ji çandê heye ku navê wê Xurfanî ye. Di dawetan de diyar dibe, stranên ku têne gotin jî taybet in. Stranên Xurfanî hem bi rengê stranê ye hem jî bi rengê govendê ye... ***R.11***



# Li hemberî tecrîdê kampanya

Li dijî tecrîdkirina Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan girtiyên siyasî 7 meh in greva birçîbûnê dane destpêkirin û çalakî didome. Her wiha bi sedan parêzer li dijî tecrîdê kampanya dan destpêkirin û partiyên siyasî bi daxuyaniya çapemeniyê xwestin tecrîd bi dawî bibe. Bi pêşengtiya Komeleya Hiqûqnasên Ji Bo Azadiyê ji bo Ocalan kampanyayeke îmzeyan hat destpêkirin. Di rojnameya Yenî Yaşamê de îlanek hat belavkirin; di îlanê de 768 parêzer û hiqûqnasan xwestin ku hevdîtina Ocalan a bi parêzerên wî re pêk bê. Parêzeran xwestin ku Ocalan bi parêzerên xwe re hevdîtinê pêk bîne û ev mafekî hiqûqî ye. .KCD û DBP'ê têkildarî tecrîda li ser Ocalan û greva birçîbûnê daxuyanî dan... ***R.3***

AZAD KURDO

## Li dîasporayê derûniyê bindestiyê... *R.8*

## Çand û ziman

Jêderk û çavkaniyên puxteyî û nirxên miletekî di zimanê wî de ye. Ev ji bo civakekê sermiyana herî mezin ya çandî ye, ne hewqasî sivik, biçûk û erzan in ku heta bên piştguhkirin. Ji bo çi ji zimanek hewqas kevn û dewlemend re bê gotin;" zimanê nenas"? Sedemê vê gotinê jî herî zêde em bi xwe ne! Ger her giya li ser koka xwe şîn dibe; wê demê em reh û rîşalên xwe zindî bihêlin ku giyayê me jî her dem geş û zindî bimîne. .. ***Melîke Altan / R.5***



## Folklora kurdî gencîne ye

Me dîsa xwe berda jêra beriya Mêrdînê û berê xwe da Binxetê, me hevpeyvînek bi berhevkarê folklora kurdî Salihê Heydo re pêk anî. Heydo got ku folklora kurdî gencîne ye... ***Hevpeyvîn Rizoyê Xerzî / R.4***

## Şahkareke epîk-fantaziyê; Hobbît

Fantazî cureyeke wêjeyê ye ku hêmanên biefsûn û dersirûştî dihewîne. Şûnwarê berhemên fantastîk piranî cîhaneke xeyalî ye. Epîk fantazî di hawirdoreke biefsûn de saz dibe. Cîhana berhemên fantastîk xwedî qanûnên xwe, xwedî afirîde, hebûn û nijadên xweserê xwe ye. Çîroksaziya wan berheman piranî bi qeder/serpêhatiya lehengekî ve girêdayî ye. Fantazî gelek jêrcureyan digire nav xwe. Realîzma efsûnî, serpêhatiyên şûr û sêrbaziyan, fantaziya tarî, fabl û çîrokên periyan jî jêrcureyên fantaziyê ne. Fantaziya nûjen di sedsala 19'an de dest pê dike. Beriya wê romans û çîrokên fantastîk hebûn ku hêmanên fantastîk ên tê de wek tiştên rast dihatin pejirandin. Tişta ku fantaziyê ji cureyên din vediqetîne cudabûna wê ya ji rastiyê ye... ***Samî Hêzil / R.11***

# Dê jin ji mirovbûnê dernekevin!

Eylem Şoreş

Dijminahiya jinan bi 'jinan' didin kirin. Belê di van rojên dawî de careke din bûyereke sosret kete rojeva jinan. Jina ku weke wezîra malbatê hatiye erkdarkirin jî di navenda vê bûyerê de cih digire. Wezîra Xizmetên Malbat û Civakê Derya Yanik di Komîsyona Lêkolînê ya diyarkirina sedemên tundiya li dijî jinan de li meclisê daxuyaniyek da. Di vê daxuyaniyê de got; 'Di pêvajoya pandemiyê de çav li zêdebûna tundiya li dijî jinan dikare bê girtin.'

Bê guman ev peyam bû sedema nerazîbûnên jinan. Nerazîbûnên jinan dikare bê fêmkirin, ev peyam divê bi vî rengî bê nirxandin ku wek pehîneke li hemû ked û têkoşîna jinan ketiye. Rojane jinên li bakurê Kurdistanê û Tirkiyeyê li dijî kuştin û tundiya li dijî jinan dadikevin meydanan û tevî hemû êrîşan jî peyamên xwe didin. Bi careke dîsa di encama polîtîkayên dij-jinan a dewletê de kesek ku weke jin tê binavkirin derdikeve pêş û peyameke bi vî awayî dide. Bi vê yekê jî ne tenê jinan di heman demê de yekitiya jinan jî hedef digirin. Ji bo ku ev jinên têdikoşin bi gumanan bikevin. Lê keseke weke Derya Yanik çiqas weke jin dikare bê binavkirin. Belkî zêdetir weke figurê pergala zihniyeta mêrserwer dikare were dîtin.

**Peymana Stenbolê û têkoşîna jinan**

Derya Yanik ji têkoşîna jinan a ji bo Peymana Stenbolê re dibêje; 'Ji ber xwevekişandina ji peymanê em nikarin bêjin destkeftiyên jinan têk çûn'. Daxwaza jinan a îstîfaya Derya Yanik di vê wateyê de, di cih de ye. Lê mixabin, divê li vê derê em balê bikişînin ser ku weke Derya Yanik beriya vê jî kesên ku peyamên bi vî awayî sosret dane hene û dikare were payîn ku wê ji niha û şûnde li welatê ku ji aliyê dijminên jinan ve tên birêvebirin ev kes jî kêm nebin. Dibe ku bê bîra we, dawiya sala 2020'î li meclisa Tirkiyeyê pirtûkeke li dijî Peymana Stenbolê hatibû belavkirin. Ev pirtûk ji aliyê Yekitiya Komeleyên Malbatan ve hatibû amadekirin. Di nav de peyamên weke 'bila dawî li Peymana Stenbolê, qanûna 6284 û newekheviya negatîf a li dijî mêran bê' hatin dayîn. Ma piştî gavên bi vî awayî gelo çiqas dûr bû? Bi van rêveçûyînan bingeha xwepaşvekişandina ji Peymana Stenbolê hat dayîn. Bi peyamên weke Derya Yanik jî niha hewl tê dayîn têkoşîna jinan lawaz bê xistin. Lê jinan li dijî vê yekê weke her tim careke din diyar kir ku ew ê dest ji têkoşîna xwe bernedin û wê kesên weke Derya Yanik nikaribin destkeftiyên wan têk bibin. Ji 2 mehan zêdetir jin li dijî biryara ku Erdogan da xwedî helwest in, xuyaye ku wê ji ber vê bêrêztiya Derya Yanik jî ji rêya xwe dernekevin û ji bo mafên xwe yên bingehîn têbikoşin.

**Pirtûka ku hatibû belavkirin!**

Belê li wir dixwazim xaleke din ji pirtûka li meclisê hatibû belavkirin bi bîr bixim. Di vê pirtûkê de tecawîza di nava zewacê de hat rewakirin û hat gotin 'Daxwaza tekiliya zayendî di nava jin û mêrên zewicî de mafê hiquqî ye'. Niha ev pirs tê bîra mirovan 'di qanûnên Tirkiyeyê de ger tecawiza jinan rewa be, wezîrên weke Derya Yanik ne mafdar in bi peyamên xwe?' Xuyaye em dikarin bêjin mesele ji kesayeta Derya Yanik gelek mezintir e! Di 8'ê Adara îsal de Erdogan rastiya welêt bi gotinan wiha bilêv kiribû: "Em nayên listîkên ku jin ango dayik, jina kesek, zarok û her wekî din ji mirovbûnê derdixin". Belê ev çavkaniya dijberiya jinan e. Dema kesek ku jinan bi van erkan'sînordar dike dibe serokkomarê welatekî, wezîr an jî erkdarên din ên welatê çiqasî dikarin pêş bikevin? Dibêjin a haveyn çawa ye ku nan çawa bibe. Lê di dawiya nirxandina min a vê carê de jî ez nanekî din a ji vê haveynê bi bîr bixim. Beriya 10 salan dema wezareta jinan bû wezareta malbatê, Fatma Şahîn ku tekane wezîra jin bû qala jinên qirêj kiribû.

Wê gotibû "Sedem çi dibe bila bibe kuştinan jinên ku hatin 'qirêjkirin' ya ji ber adetan, nîşandayînek tundiyê ne." Ev êrîş jî di dema xwe de bûbû sedema nerazîbûnên jinan. Niha di dawî de pirsek ji bo berpirsiyaran. Gelo hûn pir digerin ji bo wan dijminên jinan bibînin, an jî hûn pişt re wan kesan vediguherînin dijminên jinan? Her çawa be wê ev lîstok bi ser nekevin û jinên têkoşêr dest ji mafên xwe yên bingehîn bernedin, ji mirovbûnê dernekevin û dê pergala heyî têk bibin!





## Di warê fizîkî û fikrî de xweparastin

Li Îzmîrê dê bi pêşengiya hin xwendekarên jin ên zanîngehê atolyeya xweparastinê bê lidarxistin. Xwendekaran destnîşan kir ku jin êdî naxwazin bi tirs û xofê bijîn, lewma xweparastin bivê nevê ye.

Xwendekaran ragihand ku dê di 2'yê hezîranê de atolyeya xweparastinê li dar bixin û atolye dê 5 rojan bidome. Heya niha 50 jinan ji bo perwerdehiya xweparastinê serî li atolyeyê dane. Dê atolye bi beşdarbûyîna mamosteyên jin ên ji Stenbolê hatine li Parka Kulturê bê lidarxistin. Yek ji xebatkara atolyeyê Îzel Graca, bal kişand ser girîngiya xweparastinê.

Graca diyar kir ku bi dirûşmeya 'Xweparastin heq e' xebateke bi vî rengî dane destpêkirin û got ku mirov nizane dê talûke kengî bi ser mirov de bê û ji bo jiyanê têkoşîn divê.

**Atolyeyeke 5 rojan têrê nake**

Graca destnîşan kir ku daxwazên ji bo xweparastina fizîkî hemû encamê xweparastina fikrî ye û wiha got: "Lewma em tenê di çarçoveyeke fizîkî de li ser xweparastinê hûr nabin. Gava em bi failekî taciz û tecawizê re rû bi rû bimînin, divê bê bîra me ku kulmek me jî heye. Ev yek quweta me zêdetir dike. Lewma xweparastin di warê fikrî û fizîkî de hev temam dike."

Her wiha Graca diyar kir ku ji bo têkşikandina tirşe xweparastin bi qasî nan û avê girîng e û got ku dê atolyeyeke 5 rojan têrê neke û axaftina xwe wiha bi dawî kir: "Ev atolye dê destpêk be. Em dixwazin vê berfirehtir bikin." ***ÎZMÎR***



Biyan

Munewer Azîzoglu Bazan

# Zilamtiya jehrîn (zilamtiya toksîk)

Carinan dema mirov serê sibehan radibe, ji devê mirov tehma zingarê tê. Yan ji bêxewiyê, yan ji xemê, yan jî ji vexwarinê ye. Ev çend roj in ev tehma zingarê, tehma jehriyê ne tenê li devê me, li ezman belav bûye. Bêaramiyeke, neewlehiyeke nepenî li dora me digere. Bêhemdî hema em li dora xwe dinêrin, ka gelo dibe ku yek ji derekê derkeve, êrîş bike, gotinek bibêje, dev biavêje, yan jî tiştek din biqewime. Jehriyeke zilamtiyê li erd û ezman digere; hilma xwe, awirê xwe, siya xwe û bayê xwe li derdorê direşîne.

Gotina 'zilamtiya jehrîn' (zilamtiya toksîk) peyvek e ku vê tehma zingariyê pênase dike. Ev gotin destpêkê di salên 1980-90'î de ji bo pênasekirina mêrên ku li keviya civakê mane, wek mînak ji bo mêrên ji ber sedemên adî ketine girtîgehan, hat bikaranîn. Bi taybetî bi vê gotinê sedemên helwestên wan ên êrîşkar û tawanbar dihat vegotin. Bi vî awayî ne hemû mêr, lê rolên zayendî yên li mêran hatine birîn, wek qalib û kevneşopiyên baviksalariyê, helwestên zordar, hest û seknên ku li mêr û ciwanmêran tên birîn, tên destnîşankirin. Taybetiyên sereke yên 'zilamtiya jehrîn' ev in: Hest (taybetî yên jar) tên veşartin, tundî wek amûra çareseriya pirsgirêkan tê dîtin, ê bi hêz e mafdar e; tirs û xem nayên nîşandan; di axaftinên xwe de êrîşkar û domînant e; êrîşa zayendî mafdar dibîne; sînoran derbas dike; reqabetê de sînor nas nake; dixwaze her tiştî di bin kontrola wî de be; dixwaze her tiştî bi xwe bi dest bixe; mêrên ne sportîk cidî nayên girtin; taybetiyên 'jinikok' wek qelsî dibîne; li gorî zilamtiya toksîk jin û mêr nikarin ji hev fêm bikin û bibin heval.

Li gorî çanda zilamtiya jehrîn êrîşkariya zilam ji bo parastina hevaltiya nav mêran û sazîkirina hiyerarşiya civakî roleke girîng dilîze. 'Mêrê rasteqîn' divê li gorî taybetmendiyên jor tev bigere; an na, bi biçûkdîtinê û şikestinê re rû bi rû dimîne, bi 'serjiniktiyê' ve tê 'tawanbar'kirin. Lewma jî tê gotin ku ne tenê jin, mêr bi xwe jî di bin van binesaziyên baviksalar û rolên mêrantiya serdest de tên tepisandin. Rastî jî zilamtiya jehrîn bandora xwe bi awayekî giştî li ser civakê dike, ne tenê li dijî jin û mêrên ne li gorî wan, di heman demê de dijminatiya homo û transan jî dikin. Di roja me ya îro de êdî tê zanîn ku zilamtiya jehrîn ne tenê li keviya civakê ye, li seranserê civakê belav bûye û ne tenê xwe û dora xwe, hemû civakê bi jehrî dike.

Kesên ku li ser vê mijarê lêkolînê dikin, giraniyê didin têkiliya navbera mêran, rolên zayendî yên ku li mêran hatine birîn û bandora wan a dîsa li ser jiyana mêran. Heta têkiliya 'bav û kur' a kêm, an jî bi alozî ji bo pêşketina 'zilamtiya jehrîn' wek sedem tê dîtin. Ev di heman demî de têkiliyên wan ên hevaltiyê yên tevlihev ên bi mêran re dide der. Lê em werin ser mînakên li ser xaka Tirkiye û têkiliya wan a bi pirsgirêk a bi jinan re.

Têkiliya yekser a di navbera zilamtiya jehrîn, rastgirtên popûlîst, nijadperestî û hêzperestî ji bo fêmkirina jehriya li Tirkiyeyê belav bûye, divê bê aşkerakirin. Ango bi gotineke din, ger li hêlekê têkiliya 'bav û kur' a bi pirsgirêk asta mîkro ya zilamtiya jehrîn be, têkiliya di navbera 'dewlet-bav û kurên wî' jî asta wî ya makro destnîşan dike. Ji xeynî taybetiyên vegotî sîstematîka zilamtiya jehrîn li Tirkiyeyê hîma xwe li ser qaşo xwedîderketina/parastina sê tiştan qewîn dike: 'namûsa dewletê, namûsa mal(batê), namûsa jin'. An jî bi gotineke tirkan bi parastina namûsa 'hesp, jin û çek'ê (At, avrat, sîlah).

Dibe ku di vê mijarê de têgîna herî jehrîn a ku tehma zengarê dide devê me peyva 'namûsê' be. Bê guman ji bo zilamê bi jehrîn wateya namûsê ji bo dewletê, ji bo malbatê û ji bo jinan cuda ye. Ji bo her yekî peywîr û berpirsiyarî tên birîn û tê xwestin ku her kesek li gorî van rêbazên hatine dayîn tev bigerin. Yên li gorî rêbazan tev digerin pîroz in. Yên ku derî rêbazan derkevin bi tiliya nîşanê tên teşhîrkirin û tehdîtkirin. Yên li namûsa xwe xwedî dernekevin yekser ji pîrozbûnê dikevin asta lanetiyê. Ev hemû heta derekê li gorî hişmendiya zilamtiya jehrîn tê fêmkirin. Lê ligel qaşo mêrantiya zexm, bi hêz û tundî û qudret, parastina namûsa jinan û pîrozbûna dayikê çima hemû siyaseta zilamtiya jehrîn li Tirkiyeyê li derdora jinan dimeşe? Devê kê vebibe û diranê xwe li dijminê xwe tûj bike, bi jinan dest bi gotinê dike?

Dibe ku gelek sedemên derûnî, civakî, siyasî û pedagojîk ên vî rewşî hebin. Jinan û 'mêrên newekxwe' biçûkdîtin an jî jin û zarokan wek namûsa xwe dîtin û wan 'parastin' ev ew tişt in ku li gorî rêbaza zilamtiya jehrîn dimeşin. Lê beramberî vê 'hêz û xurtbûna' xwe û 'dijminahiya' xwe bi enstrumentalîzekirina jinan bilêvkirin aliyê din ê medalyonê ye. Parastina wan û êrîşa wan ji hev dizên. Tê gotin ku tirsa wan a herî mezin destkeftiyên xwe windakirin, ne wek mêrekî 'rasteqîn' lê wek 'jinikokekê' xuyakirin e. Ev îluzyona 'mêrê rasteqîn' hesta ewlehiyê dide van kesan, lê beramberê ve kesayetê wan bisînordar dike. Ev ewlehî li ser hiyerarşiya hêzbûnê saz dibe û herkesî wek xulamê statuya xwe dibîne. Ew ewlehiya ku qaşo bi 'mêrantiya rasteqîn' tê bidestxistin, lê li hêla din kesayeta wan a rastî ditepisîne û vedişêre, herî zêde ji hêla jinan (û ji mêrên 'serjinik') ve tê hejandin. Lewma jî jinan li hemberî rasteqîniya xwe û hêza xwe wek xetere dibînin. Ew jin in ku paça ser kesayeta zilamtiya jehrîn a parçebûyî û pelçiqandî ji ser radikin û wî bê ewlehî tazî dihêlin. Zilamtiya jehrîn dibîne ku ewlehî derew, kesayet rast e. Ew jin in ku kesayeta wan a ji (dewlet)bav-şikestî li rûyê wan didin. Lewma ye hem parastina wan û hem jî êrîşa wan li ser esasa dijminatiya jinan pêk tê.

# Greva birçîbûnê ket meha 7'an

Navenda Nûçeyan

Li dijî tecrîdê girtiyên siyasî 7 meh in greva birçîbûnê dane destpêkirin û çalakî didome. Her wiha bi sedan parêzer li dijî tecrîdê kampanya dan destpêkirin û partiyên siyasî bi daxuyaniya çapemeniyê xwestin tecrîd bi dawî bibe.

Girtiyên siyasî yên ji doza PKK û PAJK'ê girtî ne, di 27'ê mijdara 2020'î de, bi armanca rakirina tecrîda li ser Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan ku 22 sal in li Girtîgeha Îmraliyê ya Tîpa F a Ewlehiya Bilind girtiye û bidawîkirina binpêkirinên mafên mirovan ên li girtîgehan zêde bûne, dest bi çalakiya greva birçîbûnê ya bêdem û bidorveger kirin. Çalakiya greva birçîbûnê bi koma 37'emîn, nêzî 190 roj in ango 7 meh in berdewam dike. Li Kampa Penaberan a Mexmûrê û li Kampa Lavrîo ya Yewnanistanê jî bi heman armancê çalakiya greva birçîbûnê hatiye destpêkirin û didome.




**Ji parêzeran kampanya**

Bi pêşengtiya Komeleya Hiqûqnasên Ji Bo Azadiyê ji bo Ocalan kampanyayeke îmzeyan hat destpêkirin. Di rojnameya Yenî Yaşamê de îlanek hat belavkirin; di îlanê de 768 parêzer û hiqûqnasan xwestin ku hevdîtina Ocalan a bi parêzerên wî re pêk bê. Parêzeran xwestin ku Ocalan bi parêzerên xwe re hevdîtinê pêk bîne û ev mafekî hiqûqî ye.

**Li dijî tecrîdê daxuyanî**

KCD û DBP'ê têkildarî tecrîda li ser Ocalan û greva birçîbûnê ya li girtîgehan berdewam dike daxuyanî dan û wiha gotin: "Ji bo pirsgirêka kurd bi rêbazên demokratîk çareser bibe; em dixwazin demildest tecrîda li ser Ocalan bi dawî bibe. Em dixwazin demildest şertê jiyana azad a Ocalan bê temînkirin û birêz Ocalan azad bibe." ***AMED***

# Tûrikê Dedo bîra me ye!



Reyhan Îke

Em zû mezin dibin. Mîna salek bê bihar û havîn, porê temenê me zû dikeve hembêza zivistanan. Nîne demsala bihar û havînên temenê me. Nîvê jiyê me tê dizîn û jiyan her deyndarê me dimîne. Deynê me yê li jiyanê dikeve tûrikê Mehmet Emîn Ozkan.

Carna di navbera sînorekê de li mayinekê diqelibe piyê me. Hêlma mayînek kujer piyên me yên nasyarên ax û tozê, kevir û sermayê; piyên me yên hunermendên şiverêyan û kovî di nîva rê de de dibirin; diqurçife jiyê me ye nûgihayî. Û em bi hêlmek germ û dojehî zarok dimirin li vî welatî. Mohrikên çavên zarokatiya me dikevin tûrikê Mehmet Emîn Ozkan.

Her roj li ser sînorekê em bi mirina zarokên vê axê ya navê wê kolberî, qaçaxî dest bi rojê dikin. Xencerek çardev danîne ser singa welatê me. Em ji bo nan, ji bo debara jiyaaê xwe li kîjan alî ve bilivînin devek xencera nav sînor giyanek me dibire. Xewn û xeyalên me li ser hêlîn û warê me kirine kolber û qaçax, li me qedexe kirine daxwaza jiyanê. Bûne nêçîrvanên temenê me, li her kêliya demê bi hewla kedîkirinê yek ji me dixin nav xefik û davan; kirasê çarenûsekî ji me mezintir dikin kefenê li bejna jiyê me. Gêsnên xeman zû dikêlin zeviyên dilê me; giraniya barê bindestiyê, tirs û fikar, hejarî û derbederî konên xwe vedidin li ser rûyên me. Bihar û havîn diçin, piştî weşandina xezaman telteyên spî dibarin li ser porê me û em bi zarokatî tên kuştin di temenê çarenûsa xwe de. Navê dizên nan û jiyana me dikeve tûrikê Mehmet Emîn Ozkan.

Jiyê me her roj di qefesa sînga dayik û bav, heval û hogirên me de wekî berxekî li ber kêrê dilerize û em her kêliyê ji xwedayekî zilmê re tên qurbankirin li pêşiya çavên hezkiriyên xwe. Her kulanên gund û bajarên me, her dol û newala çiya û zozanên me bûne selexane; carna bi navê ol û baweriyê, carna bi navê netew û netewperestiyê, carna li ser navê parastina dewlet û demokrasiyê em tên kuştin û kevilên me lê tên gurandin bi fetwaya hişê zalim ê serdemekê. Heqîqet û rastiyên war û welatê me dikevin tûrikê Mehmet Emîn Ozkan.

Ew kalê 83'ê salî temenê zarokatiya me ye. Ew bîst û pênc salên li girtîgehê ji hezarî yek beşek ji dîlîtiya me ye. Ew wekî Dedo dihat nasîn. Kelemçeya li ser zendên wî bi sedsalane fermana kuştina me ye. Bi êşa dil ketiye Mehmet Emîn Ozkan. Ew êşa dilê civaka me ye. Tansiyon, guatra bijehr, helandina hestî, xirapbûna gurçik û rûviyan, zêde lewazbûna bedenê, kêmbûna dîtin û bihîstinê, windabûna hiş an ku jibîrkirin. Ev şêweyê birîn û qutkirina henaseya me ye. Lê bîr û baweriya me ketiye tûrikê Mehmet Emîn Ozkan. Divê em ji bîr nekin. Tiştên di tûrikê Mehmet Emîn Ozkan de ji bîrkirin, xayîntiya li hember hebûn û xwebûna me ye.

Wekî qûtê mirovan ên jiyanê, di tûrikê Mehmet Emîn Ozkan de hêvî û baweriyên me yên bi azadî û wekheviyê hene. Hezkirinên me hene. Evînên me hene. Rondikên çavên dayîkên me hene. Sond û peymanên tolgirtinên me hene. Hewlên me yên wekî mirov jiyankirinê û çirayên pêşerojên me yên ronak hene. Bi dîtin û têgihiştina tiştên di tûrikê wî de ku, ev qas sal e wî li ser piya dihêle, em jî dikarin wekî wî li hember nexweşiyên li ser me tên ferzkirin û mirina ji me re wekî çarenûs tê pêşkêşkirin bi vînek mezintir li ber xwe bidin. Ji bo me divê her mirovê bi xîret û xwedî rûmet destên Mehmet Emîn Ozkan ên lerzok deynin ser wijdana xwe; em ji bîr nekin ew sembolek baweriya bi azadiyê, rûmet û xîreta me ye.

## Saziyan xwestin Ozkan serbest bê berdan

Gelek nûnerên rêxistinên civakî ji bo girtiyê neşweş ê 83 salî Mehmet Emîn Ozkan serbest bê berdan, daxuyanî dan û bang li rayedaran kir ku Ozkan serbest berdin.

Nûner û rêveberên Komeleya Civaka Sivîl a Di Pergala Înfaza Ceza de (CİSST), Komeleya Hiqûqnasên Hemdem (ÇHD), Komeleya Înîsiyatîfa Mafan a Hatiye Dîtin, Komeleya Mafên Mirovan (ÎHD), Odeya Tabîban a Stenbolê, Komeleya Hiqûqnasan a Ji bo Azadiyê (OHD), Sendîkaya Kedkaren Xizmeta Civakî û Tenduristiyê (SES), Weqfa Mafên Mirovan a Tirkiyeyê (TÎHV), Weqfa Lêkolîna Hiqûq û Civakî (TOHAV) ji bo girtiyê nexweş ê 83 salî Mehmet Emîn Ozkan serbest bê berdan daxuyaniyeke hevpar dan.

Nûnerên rêxistinan di daxuyaniyê de bang li rayedarên hikûmet û dewletê kirin û xwestin ku Mehmet Emîn Ozkan serbest bê berdan. Nûnerên saziyan anîn ziman ku Mehmet Emîn Ozkan 25 sal in girtiye û 83 salî ye. Her wiha saziyên diyar kir ku Ozkan hem ji dilê xwe nexweş e û hem jî gelek nexweşiyên din pê re hene û bi kelepçeyê tê dermankirin.

# Malbata Şenyaşar: Em dest jê bernadin



Çalakiya nobeta "edaletê" ya Malbata Şenyaşar a li pêş Edliyeya Rihayê zêdetirî 80 roj in dewam dike. Malbat li dijî astengiyan li pêşiya avahiya Edliyeyê çalakiya xwe ya daxwaza edaletê didomînin.

Ferît Şenyaşar ku çûbû hevdîtina birayê xwe Fadil Şenyaşar ê li Girtîgeha Xarpetê dimîne, careke din hat pêşiya edliyeyê. Şenyaşar der barê hevdîtina birayê xwe de axivî û anî ziman ku birayê wî bi awayekî bêhiqûqî 3 sal in li girtîgehê tê girtin, lê ligel vê jî bi tena serê xwe li ber xwe dide. Şenyaşar, destnîşan kir ku baweriya xwe ya bi edaletê winda nakin û wiha got: "Em bi hêvî ne. Birayê min jî baweriya xwe winda nekiriye. Rojekê wê rastî derkeve holê û birayê min jî wê ji girtîgehê derkeve."

Şenyaşar têkildarî çalakiya xwe jî, bi lêv kir ku bi rojan e li Rihayê têkoşîna edaletê didin lê dewleta hiqûqê û edalet tune ye. Şenyaşar da zanîn ku wê lêgerîna xwe ya edaletê bidomînin û wiha axivî: "Em rûniştina li malê qebûl nakin. Em bi piştevaniyê vê têkoşîna xwe didomînin. 3 mirovên me hatin qetilkirin. Ji wan re soza me heye. Heta ku kesên komkujî pêk anîn, dernekevin pêşiya darazê û hesab nedin, em dest ji têkoşîna xwe bernadin." ***RIHA***



## Leşkeran gule li gundiyan reşandin

Li gundê Şêxan ê navçeya Payîzava ya Wanê, ji bo ku li qadeke berfireh kana mermeran bê vekirin îhale hat kirin. Rayedarên fîrmaya mutehît, leşker û cerdevan bi makîneyên kar çûn gund, 40 axurên li qada ku kan bê vekirin hebûn hilweşandin. Ji ber hilweşandina axuran, gundî li hev kom bûn û bertek nîşan dan. Gundiyan ji bo ku kana mermeran neye vekirin dest bi meşê kirin. Leşker û cerdevanan ji bo gundî belav bibin gule li wan reşandin. Di encama êrîşa leşkeran de 4 kes hatin binçavkirin û pişt re hatin berdan. ***WAN***



## Ciwanê ku agir berda bedena xwe mir

Behzad Mehmûdî yê ku li ber derê Ofîsa Neteweyên Yekbûyî ya li Hewlêrê agir berda bedena xwe û demekê li nexweşxaneyê hat dermankirin di roja 5'an de, bi şev li nexweşxaneyê jiyana xwe ji dest da.Di 18'ê gulanê de du ciwanên xelkê rojhilatê Kurdistanê çûn ber derê Ofîsa Neteweyên Yekbûyî ya li bajarê Hewlêrê. Ciwanan xwest bi rayedarên ofîsê re biaxivin û behsa rewşa jiyana xwe ya xirab bikin. Lê tu rayedarî ji ofîsê guh neda daxwaza ciwanan.Li ser vê yekê ciwanê bi navê Behzad Mehmudî li ber derê ofîsa Neteweyên Yekbûyî agir berda bedena xwe. Behzad Mehmudî tenê ji aliyê hevalê xwe û rojnamegerekî ve hate vemirandin, tevî agir berda xwe jî tu rayedar ji ofîsê bi hewara wî ve nehatin. Heta 20 deqeyan jî ne ambûlans ne jî alikariyek hat. Piştî 20 deqeyan Behzad bi alikariya hevalê xwe û hinek rojnamegeran rakirin nexweşxaneyê. Ciwanê ku 5 rojan li nexweşxanêyê hat dermankirin di şeva 5'an de jiyana xwe ji dest da. ***HEWLÊR***

## Mîtîngên kampanyaya ziman dest pê dikin

Kampanyaya ku Komîsyona 21'ê Sibatê ya ji Platforma Zimanê Kurdî û Tora Ziman û Çanda Kurdî pêk tê, bi daxwaza 'Zimanê kurdî bibe zimanê fermî û pê perwerde bê dayîn' di 22'ê sibatê de dabûn destpêkirin, didome. Di çarçoveya kampanyayê de wê komîsyonê biryar girt ku li Amed, Wan û Cizîrê mîting li dar bixe.Mîtinga destpêkê wê di 3'ê hezîranê de li Cizîrê pêk bê. Wê komîsyon bi heman diruşmeyan di 4'ê hezîranê de li Wanê û di 7'ê hezîranê de jî li Amedê mîting li dar bixe. Dê di mîtîngan de qala girîngiya kampanya ziman bê kirin. ***AMED***

## CIH BIDIN ZARGOTIN Û ÇANDA KURDÎ

# Folklora kurdî gencîne ye

Rizoyê Xerzî

*Vê carê me dîsa xwe berda jêra beriya Mêrdînê û berê xwe da Binxetê. Me hevpeyvînek bi helbestkar û berhevkarê folklora kurdî mamoste Salihê Heydo re pêk anî. Heydo derbarê kar û xebatên xwe yên berhevkariya bi salan de ji rojnameya me re axivî. Li rojavayê Kurdistanê dema ku behsa stran û folklora kurdî dibe herî pêşî navê mamoste Salihê Heydo tê bîra mirov. De ka em bi hev re li xebat û jiyana vî kedkarê folklora kurdî mêze bikin.*

**Salihê Heydo wekî helbestkar û berhevkarê folklorê tê nasîn, em dixwazin tu ji kerema re hinekî behsa xebatê xwe bikî, niha tu çi dikî û bi çi karî ve mijûlî?**

Xebatên min ên berhevkariyê pêşî ji derdorê dest pê kirin, li gundê min û gundên derdorê dom kirin. Destpêkê min gotinên pêşiyan kom kirin, piştre jî stran û çîrokan, her wiha metelokên zarokan û cil û bergan. Piştre ji Geliyê Çeqelan heta Ava Mezin, herêma Dêrika Hemko, Çilaxa, Tirbespiyê, Qamişlo, Amûdê, Dirbêsiyê, Serê Kaniyê, Kobanê û Efrînê yên Rojavayê Kurdistanê geriyam û min nimûne kom kirin.

Zehf razî me bê guman, ez di kar û xebata xwe ya çandeyî de wek helbest çîrok bend û mijarên cuda cuda de berdewam im, her wisa ez hîn lêkolîn û gera xwe li ser hemû tiştên bi kurdiyatiyê ve girêdayî mijûl im û dersdariya meteryala zargotinê û wêjeya kilasîk di zanîngeha Rojava de dikim.

**Demeke dirêj e ku me hev nedîtiye lê li gorî ku tê bîra min derdora salên 90'î me hev li Qamişlo dît û wê demê te behsa projeyeke xwe ya folklorê dikir, şaş neyê bîra min te bi hezaran stranên folklorî û pê re jî govend û cilên wê herêmê berhev kiribûn. Tu dikarî hinekî behsa wê xebatê bikî û niha ew berhem û xebat li ku ne?**

Rast e me ji mêj ve hev nedîtiye lê min pirsa we dikir ew kar û xebata min a li ser folklora kurdî hîn jî berdewam e. Heya niha min 3000 dîlokên kurdî berhev kirine tev şiroveya wan û deverên ku min jê hildane 1200 sirûdên lîstokên zarokan û 1000 mamik û 500 zûgotinok û 500 çîrokên kurdî yên hebû tune bû di gel 300 serpêhatiyên jîwarî û 200 qerf û tinaz û pêkenokên gelêrî her wiha 4000 îdyom û gotinên pêşiyan di gel şirovekirina wan min hemî nivîsandine û kirine belge, bi giştî heya niha 44 pirtûkên min hatin çapkirin û hîn 33 li bendê çapkirinê ne.

Ji bilî vê xebatê min 7000 wêneyên keç û jinên kurdan di gel mêran bi cil û bergê kurdî yên folklorî resen kişandine gund bi gund, bajar bi bajar herêm bi herêm, eşîr bi eşîr da ku ev xeml û xêza bedew winda nebe û em bi nifşên nû bidin naskirin.

**Gava tu rewşa salên 80–90'î didî ber çavên xwe û bi rewşa niha re didî ber hev cudahiyeke çawa derdikeve holê?**

Wekî hûn dizanin wê demê em di bin şert û mercên gelekî zehmet de dijiyan. Bê guman di wî hingî de tirs alozî, lêpirsîn û girtin hebû, xebata me bi dizî bû, me sed hesab û paxav dikir ji ber çanda kurdî bi giştî qedexe bû lê tevî wan aloziyan jî ez ranewestiyam. Ji ber min bîra rojeke weke îro dibir û min çanda miletê xwe diparast, lewra çanda milletekî ji ortê rabe ew millet bi xwe ji ortê radibe, lê niha rewş gelekî xweştir e. Ez bi serbestî û azadî dikarim tev bigerim û destekdayîn jî ji bo vî karî pêşkêş dibe. Bi dehan weşanxane çapxane navendên çandê yên kurdî çêbûne û saziyên ku vê çanda pîroz diweşînin timî amade ne

**Tu helbestên xwe hê jî bi awayê klasîk, bi wezin û qafiye dinivîsî, nêrîna te li ser helbesta nûjen ango ya serbest bê wezin û qafiye çi ye û çi cudahî di navbera her du şêweyan de heye?**


Belê ez hîn kilasîk dinivîsim û min 10 dîwan dane çapkirin hemî kilasîk in ji ber ez xwe di kilasîkê de dibînim. Lewra li gor dîtina min helbesta nûjen jî celebek e ji celebên dahênan û wêjeyî ye. Ji ber wêje gelek celeban bi xwe ve digire weke çîrok roman, gotar, şano helbest bend hwd. bila navê helbesta nûjen jî bi navekî dîtir be, lê li cem min naverok girîng e, gelo armanc û daxwaza we pêk tîne yan na? Ne ku herçî yên helbesta klasîk dinivîsin ew serketî ne û ne jî herçî yên nûjen dinvîsin ew binketî ye. Ez bi xwe li naverok û daxwazê dinêrim lê li gor min weke helbestê, ez klasîk bi navê helbestê dibînim, ji ber awazên wê, kêşeya wê, terazûya wê, rêzbenda wê û malikên wê xweşbûna xwendina wê li ser guh û hestê xwîner û guhdaran.

**Li gorî te xwedîderketina li folklorê tê çi wateyê û ji bo xwedîderketina li folklora kurdî divê çi were kirin?**

Bê guman folklor tarîxa milet ya nenivîsandî ye, raborî û xêr û şerê wî di hemî qonaxên jiyana wî de destnîşan dike. Lewra ziman e, nasname ye , dîrok e, gel e neynik e, samane ,hebûn e çande û gel û welat bi xwe ye.

Her wiha ji bo parastin û vejandina wî pêwîst e ku navendên taybet ji bo wî bêne duristkirin. Di dibistan, fakulte û zanîngehan de ders bên dayîn û şirovekirin. Lêkolîner û rewşenbîrên dilsoz xwe jê re terxan bikin û her wiha divê destekdayîn bi comerdî ji wan re bê mezaxtin û terxan kirin; radyo û televîzyonên taybet ji bo wî programan biweşînin ku nifşê me yê bê dewlemendbûn û wateya folklora xwe nas bike. Ez dibînim di îro de bere bere tiştin wilo pêk tên.

> Heya niha Heydo 3000 dîlokên kurdî berev kirine tev şiroveya wan û deverên ku jê hildane 1200 sirûdên lîstokên zarokan û 1000 mamik û 500 zûgotinok û 500 çîrokên kurdî yên hebû tunebû di gel 300 serpêhatiyên jîwarî û 200 qerf û tinaz û pêkenokên gelêrî



**Ji kerema xwe der barê kar û xebatên xwe yên niha de tu dikarî çi bi me re parve bikî û peyama te ya dawî ji bo rojnameya me û ji bo xwînerên rojnameyê çi ye?**

Ez di kar û xebata xwe de berdewam im, ez hîn jî berhevkarî û nivîsandinê dikim, bê westan ez di Zanîngega Rojava de semînerên li ser folklor û wêjeya klasîk didim. Her wiha di Rojava TV de bernameyeke heftane li ser çanda dêrîn pêşkêş dikim û di ART Fm de programeke heftane li ser navê folklora me pêşkêş dikim.

**Gelo tu saziyên ku berhevkariyê dikin niha li Rojava hene û ji bo xebateke bi rêk û pêk a berhevkariyê çi lazim e?**

Belê di saziya zimên de li rojava beşekî berhevkariyê ji bo folklorê heye tenê karê wan berhevkirina folklorê ye.

Û pêwistî bi dokumenteriyeke bi vî awayê jêrîn pêk te:

Kamerayên vîdeo ku lîstik û govendan bikişînin ji bo lebt û liva dîlanê

Dengê dengbêj û zargotinbêjan bê tomarkirin ji bo awa û melodiya wan dîrok û stranan bê belgekirin.

Her wiha mêlodînivîsên pispor wan mêlodiyan li ser rûpelê dîrokê û stranê binivîsin da ku di demê bê de xweş bêne xwendin ji hêla her kesî ve.

Fotoyên cil û bergan hem bi vîdeo û hem bi kamerayan bê kişandinê. Ev tişt û pêwîstiyên herî sereke ne.

**Ger em xatirê xwe bi helbestê ji xwîneran bixwazin tu yê kîjan helbesta xwe diyariyê wan bikî?**

Di dawiyê de ez sipasiya rojnameya we dikim ku ev hevpeyvîn bi min re çêkir û ez berdewamî û pêşketinê jê re hêvî dikim ji ber xizmeta çand û zimanê me dike û dîsa hêvî û daxwaza min ji we ew e ku hûn pir li ser folklor, zargotin û zimanê kurdî bisekinin. Dawiya dawî ji vê helbestê diyariyê xwînerên rojnameya we dikim.

**Evîna yarê**

Mi yarek dî gelek naz e
Ciwan û terx û evraz e
Kulîlka gewr û gulyaz e
Hiş û sewda ji min biribû

Ji min birye hiş û sewda
Kezeb sotî li min kew da
Şevê pê de nemam, xewda ji tîrêd
çav û awir bû

Li ser dêman du reşbisk in
Bixûr û enber û misk in
Di rengê şeb û şevnisk in
Belê gerden cewahir bû


Li ser çeşman du ebrû ne
Di tara sor û zergûn e
Rûmehtaba li gerdûne
Dida rewşen çi bahir bû

Bi çavan tîr li min dane
Kevan û qews çi hilda ne
Serê wana di dil da ne
Ji rengê şîşê sîxwir bû


Kezî hatin heya newqê
Ku mahî jê dibî şewqê
Mi dest biryê kirî tewqê
Bi min horî xawir bû

Dilê Heydo me êşîne
Tu tîran lê nekêşîne
Li sînga xwe bikovîne
Guneh bû xortkî şair bû

## Salihê Heydo kî ye?



Helbestkar û berhevkarê folklorê mamoste Salihê Heydo di sala 1956'an de li gundê Hesê Oso yê girêdayî Amûdê hatiye dinyayê. Xwendina xwe ya seretayî li gund û ya navîn jî li bajarê Hesekê kiriye. Heta niha 76 pirtûk amade kirine û ji wan 44 pirtûk hatine çapkirin û hîn 33 li benda çapkirinê ne. Niha li Zanîngeha Rojava dersdariya meteryala zargotinê û wêjeya klasîk mamostetiya beşa folklorê dike.



# Di perwerdeyê de derew



Amed Tigrîs



Armanca hemû dê û bavan ew e ku zarokên xwe bi kesayetiyeke pak û serbilind, zana û bixwebawer perwerde bikin. Zarokên wan di jiyana xwe de her serkeftî, xwedî pêşeyeke payebilind, karekî baş û bextewar bin. Di nav heval û civaka xwe de mirovên qedirşînas û serbilind bin.

Berpirsiyariyên dêûbavan yek jê jî ev e ku ew bixwe ji zarokên xwe re bibin rêber û nimûneyeke baş. Bi helwest û pratîka xwe dirustî û rastiyê nîşanî zarokên xwe bidin û bawerîyê bidin wan.

Rê, şans û derfetan ji bo zarokên xwe pêk bînin, kêmasî û şaşiyên xwe sererast bikin. Dersên erênî bi dest bixin.

Divê dêûbav li gotinên xwe dîqet bikin, zarokan nexapînin, dirust bin û nehêlin ku zarokên wan jî derew bikin. Ji xalan xaleke girîng jî ev e ku divê dêûbav li ba kesên din dilê zarokan nehêlin, biçûk nexin. Lê şaşiyên wan bi zimanekî xweş bi wan bidin zanîn û sererastkirin.

Derew û xapandin bandoreke gelek neyînî li ser giyan, jiyan û karakterê zarokan dikin. Ev ji destpêkê heta dawiya jiyanê form, kesayetî û karakter dide zarok ku piştî re guhertina karekter û kesayetiya formgirtî gelek zehmet dibe.

Di mijara derew û xapandinê de, dêûbav pêwîst e zana û serwext bin. Zarok her tim dêûbavê xwe teqlîd û kopî dikin. Çi dibe bila bibe, dêûbav divê rastiyê ji zarokên xwe re bêjin û wan nexapînin. Zarokên biçûk wekî temenmezin qebûl bikin û li gel wan rastiyê bêjin. Nebêjin ku ew biçûk in, baş tênagihîjin, divê ez wê bixapînim an bi vê metodê amoş û îqna bikim.

Zarok dema dibîne ku dêûbav rastiyê nabêjin û derew dikin, ew jî ji dêûbavên xwe hînî derew û xapandinê dibin. Wek nimûne dema zarok ji dê an bavê xwe dixwaze pêlîstok, xwarin, sol an kinceke bikire û dêûbav bêjin, "niha pereyê me tune, dema pere ket destê me, em ê bikirin." Zarok dibîne an dizane ku di berîk an çenteyê wan de pere hene, lê derew dikin û dixapînin.

Ew zarok êdî ji dêûbavê xwe bawer nake. Bandoreke neyînî li ser zarok dihêle. Heke dêûbav nebêjin "pereyên me tune, lê bêjin, "ev pere ji bo mesrefa me ye, piştre ku ket destê me, em ji te re bikirin," wê demê zarok rastiyê hîn dibe. Nimûneya duyem: Li Tirkiyê zarok dema dest bi dibistanê dike bi îdeolojîke nîjadperest tê perwerde kirin.

Li malê dêûbav, li dibistanê mamoste û medya rojane dibêjin û dinivîsin ku "li Tirkiyê her kes tirk e. Ne Kurdistan heye û ne jî kurd û gelen din." Ew bi vê perwerdeya nîjadperest û derew mezin dibe. Ew jî wek mezinên xwe dibin parêzvanên vê îdeolojiya nîjadperest û derew. Nimûneya sêyem jî: Malbat bi otomobîla xwe diçin, bav otomobîlê dajo û bi paş ve li otomobîla li pêş xwe dixe û qeza çêdibe. Polîs tê, bav dibêje,"ne xetayê min bû, xetayê şoferê din bû."

Halbû ku zarok bi çavên serê xwe dibîne ku bavê wî derew dike. Li vir dêûbav ji zarokên xwe re dibin nimûneyeke xerab. Zarok jî di proseseke dûr û dirêj de hêdî hêdî exlaq û karakterê dêûbav kopî dike.

Pêngava duyem dema zarok piçek mezin dibe û dest bi zarokxane an dibistanê dike, mamoste, heval û civat jî dikevin nav wê qad û hejmara teqlîd û kopiyan.

Zarok dibîne ku mamoste û hevalên wî jî weke dêûbavê wî rastiyê vedişêrin û derew dikin. Ew her ku mezin dibe ferq dike pirtûkên ku dixwîne jî li ser derew û xapandinê hatine amadekirin. Li medyayê dinêre bûyerên ku li derdora wî dibin, rastiyê nabêjin û nanivîsin. Her ku mezin û kamil dibe, dibîne ku dîrok, cografya, çand, ol li ser bingehê derew, înkar û xapandinê hatine avakirin. Serok, wezîr, mirovên payebilind û bawerhişk ji her kesî bêtir derewên herî mezin û bêbinî dikin û ji bo berjewendiyên xwe xelkê dixapînin.

Li ser lingekî hezar derewî dikin û sond dixwin. Bingehê sîstemên otokratîk, nîjadperest û paşverû li ser derew, xapandin, xurafe û mîtolojiyan hatine avakirin. Li welatên weha divê berî her tiştî sîstema perwerde ya mal û dibistanê ji binî ve werin guhertin. Ji mirovên azad, durist, dadmend û rastgo civat û sîstemên demokratîk tên sazkirin. Li ser bingehê perwerdeya otokratîk, derew û xapandinê hemû ferdên civatê xwenda û heta ji çend zanîngehan mezûn bin jî, bi kesên weha demokrasî, dadmendî û wekhevî nayê avakirin. Îro li Rojhilata Navîn gelek civat û dewletên paşverû û otokratîk hene.

# Çand û ziman

Melîke Altan



Her neteweyek xwedî çandekê ye. Têgîna çandê ji reng û dengê neteweyan pêk tê; ev jî hebûna gelan sembolîze dike. Hebûn û tunebûna şaristanî an jî miletan li aliyek girêdayî hêza fizîkî be, li aliyê din jî girêdayî hêza çandê ye.

Di nav neteweyan de şermkirina ji axaftina zimanê xwe pir kêm bûye babet; lê mixabin di nav me de ev yek bûye mijara gotinê! Kengê bi axaftina zimanê xwe em serbilind bûn û me xwe bi rûmet hesiband, wê demê pêşketina zimanê me jî pêkan e. Rast e, ji bilî zimanê xwe, zanîna zimanên biyanî dewlemendî ye ji bo mirovan lê; ne ku mirov li hember zimanên biyanî, zimanê xwe jî biçûk bihêle an jî biçûk bibîne.

Bi hewldanên pêşxistin û parastina ziman ancax em dikarin dîroka raboriya xwe bibîr bînin û dema xwe û siberojên xwe bi zimanê xwe zindî bihêlin. Di vê yekê de pêdivî bi hezkirin û wêrekiyê heye. Bi wêrekî û bi hezkirinê li xwedîderketina ziman, him wî diparêze û him jî bi hêz dihêle.

Li ciyê ku em nifşên nû bi zimanê xwe rakin û bi axaftina zimanê xwe serbilind bibin, em ê çima ji axaftina zimanê xwe şerm bikin ku heta em zarokan ji zimanê wan bêpar bihêlin? Heta îro destan û evîn; serborî û lehengî, çîrok û hwd. ku di erdnîgariyên welatê me de hatine jiyîn; bi şêweyên devkî û nivîskî bi vî zimanî hatine gotin û nivîsandin.

Ev yek jî bi navgîna ziman pêk hatiye û hatiye parastin. Ziman ne xurt lê, qels û lawaz be; bê şik reseniya wan berheman jî dadikeve. Heke çand bê wateya hebûnê, wê demê bi tunekirina çandê re mirovên ku çanda wan tê tunekirin; bîr û raman û rihê wan jî tê tunekirin. Civaka ku ev nirxên wê hatine desteserkirin, dil û bîr û bawerî,raman û rehê wê lawaz û tune be; ew civak, pûç û vala û bêfeyde dibe, pêşketin bi tu awayî ne gengaz e.

Lewra her tim xwe di bin karîgeriya çandeke bihêz û serdest de dibîne. Bi vî awayî ew civaka ku ji neteweyek pêk hatiye ji aliyê çandî ve tune dibe. Ger xwe bi xwe mirov zimanê xwe bê nirx û bê qîmet û piştguh bike, ji parastina wî re nebe alîkar, êdî ji bo lawazkirin û tunekirina wî zimanî pêdivî bi hêzek serwer namîne ku heta ew ziman bê tunekirin.

Em çima qedera zimanê xwe ji hêzên çewsîner re bihêlin ku heta ew li gorî xwe teşeyekê ji tunebûnê bidinê? Hêjayî gotinê ye ku çaxê hêzek serdest xelkekî bixe bin metîngeriya xwe, her wisa lawaz û bê nasname bike; di serî de çanda wî qedexe dike, bermahiyên dîrokî tune dike.

Ji bo ku gel ji zimanê xwe, ji bîr û baweriyên xwe; bi giştî ji hemû nirxên xwe dûr bikeve, bi hemû awayî qels dike û hemû çavkaniyên wî gelî bi awayek pêkûtî bêbandor dihêle. Ev yek jî sedama qelsbûn an jî windabûna çandê ye.

Jêderk û çavkaniyên puxteyî û nirxên miletekî di zimanê wî de ye. Ev ji bo civakekê sermiyana herî mezin ya çandî ye, ne hewqasî sivik, biçûk û erzan in ku heta bên piştguhkirin. Ji bo çi ji zimanekî hewqas kevn û dewlemend re bê gotin:"Zimanê nenas"?

Sedemê vê gotinê jî herî zêde em bixwe ne! Ger her giya li ser koka xwe şîn dibe; wê demê em reh û rîşalên xwe zindî bihêlin ku giyayê me jî her dem geş û zindî bimîne. Ji ber ku rihê civakek ji çanda wê pêk tê. Divê çand bê parastin ku civak jî çalak û parastî bimîne.

Ez dixwazim dawiya nivîsê jî ji helbesta Boraboz ya bi sernivîsa (Bi hev re) bigirim ku wek helbesta yekemîn ya Kurd tê zanîn û dîroka xwe digihîje bi sedan salan heta berî zayînê. Mebest ji vê sernivîsê ji bilî bihevrebûnê, mînakek ji mînakên niviskî ya dîroka kevnar a zimanê Kurdî ye. Werin em "bi hev re" zimanê xwe zindî bihêlin, bila zimanê me jî bi Kurdî bigere!

H. Halît Alaçati

# Îtîrafên Peker ne sedem in encam in

Çeteyê girêdayî dewletê Sedat Peker ev demek e li xwe mikûr tê. An jî bi gotinek din sûcên dewleta tirk vedibêje. Li ser nîqaşên Peker û faşîzmê gelek senaryo tên gotin. Heta wate û hêzek ji Peker zêdetir wexfî wî tê kirin. Qaşo ev îfşat dê faşîzmê têk bibe. Li aliyê din ji aqildanê senaryoyeke kambaxtir tînin ziman. Li gorî wan jî qaşo di encama van îfşaatan de dê tiştek neguhere. Her du senaryo jî li ser bingehek xelet tên nîqaşkirin. Ji bo vê yekê encamên xelet jî tên derxistin. Baş e gelo rastî çi ye?

Werin em bi hev re rastiyê bi awayê herî zelal û kurt vebêjin. Tişta em di dawiyê de bêjin, em di serî de bînin ziman baştir e. Îfşatên Peker ne destpêk û sedem e lê encamek e. Encama têkçûna pergala faşîzmê ye. Ji ber ku Peker van îtîrafan dike dê Erdogan û pergala wî têk neçe. Ji ber ku pergala faşîzmê têk diçe kesên wekî Peker derdikevin. Ango Peker û gotinên wî di encama têkçûyîna Erdogan de derketin holê. Bandorê li ser çûyîna Erdogan dike lê bi serê xwe sedem nîne. Ji ber vê yekê pirsa gelo, "Sedem çi ye?" derdikeve holê.

Em niha behsa sedemê bikin. Li vir jî em gotinê dirêj nekin. Sedema têkçûna faşîzmê têkoşîna azadiya gelê kurd e. Hêza Erdogan û pergala wî têk dibe ev têkoşîn e ku li hemû eniyan bi destanî tê meşandin. Vê têkoşînê hemû hesabên faşîzmê têk birin. Faşîzm bi bin ket û pêvajoya belavbûnê dest pê kir. Tam li vir ji kerema xwe gotina, "Beriya Garê û Piştî Garê" bînin bîra xwe. Rast e ev tam encama Garê ye.

Faşîzmê ji bo ku gelê kurd têk bibe û "Projeya Hilweşandinê" bi encam bike hemû hêza xwe seferber kir. Lê hêza wî têra têkbirina gelê kurd û hêza wî ya têkoşînê nekir. Ji çar aliyên cîhanê çete anîn. Wan jî têrê nekir. Vê carê gazî hemû mafya, tecawizkar û hêzên tarî yên dewletê kir. Vê jî têrê nekir. Têkoşîna azadiyê li hemû eniyan li ber xwe da û bi ser ket.

Ev şerê topyekûn belaş nehat meşandin. Ji bo bûtçeya şer, dest bi dizî, talan û karên mafyayê kirin. Li ser vî esasî bi Peker, Çakici û kesên din ên sûcdar re hevkarî kirin. Encam? Encam ku di vî şerê qirêj û topyekûn de bi ser biketana dê bi hev re wekî birayan bimeşiyan. Dê pergala heramiyan bidomandana.

Lê ew û şerê wan ê qirêj têk çû. Ji ber ku têk çûn jî belavbûnê dest pê kir. Niha her kes dixwaze sûcê biavêje ser yên din. Ji bo xwe xilas bikin, hevûdu îfşa dikin û sûcên bi hev re kirine aşkera dikin. Peker encama vê pêvajoyê ye. Encama têkçûyînê ye. Ji bo wê me got Peker ne sedema têkçûyîna Erdogan e, encama tekçûyîna wî ye.

Baş e pêvajo dê çawa bidome?

Erdogan xwedî li Soylu derket. Ev normal e. Ji ber ku hevkarên sûc in. Ku dest ji hev berdin dê di demek kin de ji holê rabin. Hevkarên sûc dema ji hev vediqetin wekî Peker zû bi zû şahidiyên li ser hev dikin. Çiqas dosya di destê Soylu de ne û dê çi îfşaatan bike ne diyar e. Ji bo vê ne mimkun e Erdogan û Bahçelî dest ji wî berdin. Ku hev bigirin dibe demek din emrê xwe dirêj bikin. Erdogan û Bahçelî hewl didin emrê xwe dirêj bikin.

Lê çi bikin bila bikin serencama wan naguhere. Ji ber ku êdî hêzeke têkçûyî ye. Tekane hêviya wan operasyona Avaşîn, Zap û Metînayê ye. Lê ji wir jî xeberek xêrê ji wan re nayê. Li hemberî têkoşînê xitimîne. Dê heta dawiyê di vir de israr bikin. Bes dê darbeya dawî jî ji wir bixwin.

Çawa li Rojhilatê Deryaya Spî, Lîbya û Sûriyeyê hesabên wan û xewnên wan bûn kabûs dê li başûrê Kurdistanê jî heman şerbetê vexwin. Êdî pêşiya vê têkçûyînê nayê girtin. Ji ber ku têkçûyîn temam bû. Bi krîzên siyasî, aborî, civakî û leşkerî yên ev du sal in didome, têkçûyîn temam bû.

Peker bêdeng bikin jî dê Pekerên nû derkevin. Sûc û kirinên wan dê di her kêliyê de derkevin pêşiya wan. Dê zêdetir bi qirika hev bigirin. Gelê kurd jî dê têkoşîn, berxwedan û rêxistinbûna xwe xurt bike û rêya xwe bidomîne.

# Divê partiyên kurd bêdengiya xwe bişkînin

Navenda Nûçeyan

Dewleta tirk di 23'yê nîsanê de li başûrê Kurdistanê operasyonek berfireh da destpêkirin û operasyona ku hatiye destpêkirin bi dijwarî didome. Her wiha roj bi roj bertekên gel, sazî, partî û rêxistinên kurd û Kurdistanê jî dijî van êrîşan zêde dibin.

Têkildarê armanca operasyona dewleta Tirkiyeyê û bêdengiya li hemberî vê operasyonê Endamê Rêveberiya Nivîsgeha Siyasî ya Partiya Aştiya Demokratîk a Kurdistanî (P.A.D.K), Muslim Ebas axivî û wiha got: "Dewleta tirk her tim ji bo têkbirina armancên gelê kurd dixebite û ji her aliyî ve li dijî têkoşîna wan şer dike."

**Bêdengiya hikûmeta Başûr**

Ebas bal kişand ser bêdengiya hikûmeta başûrê Kurdistanê û ev tişt anî ziman: "Ev bû çend meh, dewleta tirk a dagirker dest bi êrîşên li dijî axa başûrê Kurdistanê kiriye, her wiha tevahî cureyên çek û balafiran li pêş çavên hikûmeta Başûr di êrîşên xwe de bi kar tîne. Ev diyar dike ku ew hevkarê van êrîşan e."

Muslim Ebas bi bîr xist ku beriya salekê, Serokê Hikûmeta Başûrê Kurdistanê Nêçîrvan Barzanî serdana Tirkiyeyê kiriye, her wiha Wezîrê Karên Derve yê Tirkiyeyê Mevlut Çavuşoglu gotibû ku bi hevkariya Hikûmeta Başûrê Kurdistanê, dê PKK'ê tune bikin.

**Hincetên operasyonan**

Ebas da zanîn ku dewleta Tirkiyeyê bi hinceta ku PKK'ê li ser 'ewlehiya neteweyî' xetere ye, her tim êrîşî başûrê Kurdistanê dike, lê berovajî wê dewleta tirk ji bo ewlehiya neteweyî ya kurdan xetereyeke mezin e.

Di axaftina xwe de Ebas destnîşan kir ku zêdetirî 34 navend û baregehên tirk li ser axa başûrê Kurdistanê hene, baregeha wan a herî mezin li herêma Başîqayê ye û wiha dewam kir: "Îro jî dewleta tirk hewl dide ku baregehê ji xwe re li herêma Metînayê ava bike da ku Qendîl û Dihokê ji hev qut bike."

**Bang li hêzên kurdan kir**

Her wiha Muslim Ebas herî dawî bang li hemû hêzên kurdî û hikûmeta başûrê Kurdistanê kir ku bibin yek û piştgiriyê bidin gelê xwe û wiha dawî li axaftina xwe anî: "Her wiha ji bo doza kurdî bixebitin, ji ber ku yekitiya partiyên kurd bingeha avakirina yekitiya neteweyî ye. Divê hemû partiyên kurdan ên başûrê Kurdistanê bêdengiya xwe bişkînin û helwesta xwe di der barê êrîşên dewleta tirk û çeteyên wê de li dijî Zap, Avaşîn û Metînayê nîşan bidin. Ji ber ku dewleta tirk her gav ji bo tunekirina HPG'ê dixebite, em hemû dizanin ku tenê gerîla ji bo azadî û aştiya gel dixebite."



# WHO'yê derziya koronayê radestî Rêveberiya Xweser kir




Beşa yekem a derziyên vîrusa koronayê bi navê 'AstraZeneca' ji aliyê Rexîstina Tenduristî ya Cîhanî, radestî Rêveberiya Xweser a Rojavayê Kurdistanê hat kirin.

Derbarê derziyên 'Astra Zeneca' yên koronayê de, çavdêrê beşa derziyan a Nexweşxaneya Gel a Hesekê Zekeriya Mihemed diyar kir ku ev beşa yekemîn e, derzî digihîjin Hesekê û dê derzî li ser du merhaleyan bin û ev tişt anî ziman: "Merhaleya yekemîn, dê li ser kadroyên tenduristiyê bê ceribandin, ji ber ku her tim di nav nexweşan de ne.

Piştî derziya yekemîn bi du mehan dê derziya duyemîn jî were lêxistin. Tu bandorên din ên vê derziyê tune ne; ji ber vê jî tu nîşane li ser kadroyên tenduristî yên ku derzî birine diyar nebûne."

Her wiha Mihemed destnîşan kir ku merhaleya duyemîn ên derziyên vîrusa koronayê jî, dê li ser kesên temenmezin ku nexweşiyên giran bi wan hene, bê bikaranîn. ***QAMIŞLO***



# Almanyayê Qirkirina Namibyayê nas kir

Hikûmeta Almanyayê ragihand ku qirkirina Namibyayê cara ewil wekî "qirkirin" nas dike. Her wiha Almanya ji bo jinûveavakirina welat dê bi qasî 1.1 milyar Euroyî dest bi bernameya piştgiriya darayî bike.

Di navbera salên 1904 û 1908'an de hêzên mêtinger ên Almanyayê li Namibyayê ji gelên herero û nama bi 10 hezaran kes qetil kirin. Dîroknasan, van bûyeran wekî qirkirina ewil a sedsala 20'emîn bi nav kirin.

Almanyayê qebûl kiribû ku di wê demê de li Namibyayê zilm çêbûye lê dayîna tazmînata madî red dikir.

Derbarê vê mijarê de Wezîrê Karên Derve yê Almanyayê Heiko Maas daxuyaniyek nivîskî weşand û di daxuyaniyê de ev tiş hat gotin: "Ew ê ji îro û pê ve van bûyeran, ji perspektîfên îro, bi fermî wekî qirkirin pênase bikin."

Heiko Maas di daxuyaniyê de bal kişand ser peymana ku di encama muzakereyên 5 salan ên bi Namibyayê re pêş ketiye û da zanîn ku ew ê bi berpirsyariya dîrokî û ehlaqî ji gelê namibyayê û mexdûran efû û lêborînê bixwazin.

**Qirkirina Namibyayê**

Namibya di navbera salên 1884 û 1915'an de, di bin mêtingeriya Almanyayê de bû. Piştî re 75 salan di bin birêvebirina Afrîkaya Başûr de ma. Namibya di sala 1990'î de serxwebûna xwe bi dest dixe.

Qirkirina Namibyayê, di sala 1904'an de bi serhildana gelê Namibyayê ya li dijî hêzên alman ên dagirker ku dest didan ser ajalên wan û axa wan dest pê kir. Bi serhildanê re fermandarê alman Lothar Von Trotha fermana qirkirinê da.

Di qirkirinê de hejmara kuştiyan ne zelal e. Lê hinek dîroknas dibêjine ku hejmara kuştiyan nêzî 100 hezarî ye. Dîsa tê texmîn kirin ku ji gelê herero di navbera 65 hezar û 80 hezar, ji gelê nama jî di navbera 10 hezar û 20 hezar kes hatine kuştin. ***BERLÎN***

# Rêbazeke tunekirinê; Qutkirina avê

Endamê Desteya Rêvebir ê PYD'ê Mihemed Şêxo têkildarî kêmkirina avê ya li ser herêmê axivî û got ku ev yek rêbazeke tunekirinê ye

Navenda Nûçeyan



Tirkiye ji 27'ê çileyê ve ava Çemê Firatê li ser gelê Sûriye û şêniyên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê qut kiriye. Di nava van 4-5 mehan de Tirkiye hem êrîşên bi komên girêdayî xwe didomîne hem jî avê li ser gelê herêmê qut dike ku rê li ber karesatên mezintir veke. Di van rojên dawî de rewşa şêniyên li herêmê her diçe xerabtir dibe, hejmara nexweşên ku bi ava kêmbûyî bi jehriyê dikevin zêdetir dibe.

Endamê Desteya Rêvebir yê PYD'ê Mihemed Şêxo têkildarî kêmkirina ava Çemê Firatê bi rojnameya me re axivî.



Şêxo diyar kir ku ger hêzên dewletên navneteweyî dengê xwe bilind nekin dê bêavî bibe sedema karesatên mezintir.

**Bandora qutkirina ava çem**

Endamê Desteya Rêvebir Mihemed Şêxo têkildarî ava Çemê Firatê da zanîn ku deriyê sê welatan ê aboriyê ye û wiha got: "Wek tê zanîn ku çavkaniya Çemê Firatê li bakurê Kurdistanê ye û ji Sûriyeyê derbasî Iraqê dibe. Li ser vî çemê xwezayî ku di her sê welatan de derbas dibe gelek însan debara xwe dikin û dibe çavkaniyeke aborî ji bo her sê welatan. Lewra jî li gor zagonên navneteweyî ev av hewce ye neyê birîn û ev her sê welat jî ji vê avê bêpar nemînin. Gelên li derdora çem bi hezaran salan e dijîn, çandiniyê dikin. Ev jî şêwazeke aboriyê ya ji bo van gelan a herî baş e. Derveyî vê yekê ji bo peydakirina elektrîkê pêwistî bi ava çem heye. Projeyên avdan û çandiniyê yên ji aliyê Rêveberiya Xweser ve hatine amadekirin dibûn alikariyeke mezin ji bo hemwelatiyan, li herêmê dibû sedema aramiyê. Her wiha bi saya vê avê gelê rojhilat û bakurê Sûriyeyê koçber nedibûn, debara xwe pê dikin û aboriya xwe bi rê ve dibin."

Şêxo destnîşan kir ku kêmkirina avê rê li ber gelek nexweşiyan jî vekiriye û wiha pê de çû: "Lê mixabin bi birîna ava Firatê re derbeyekî mezin li aboriya herêmê ket û heta wisa ku bandora xwe li ser tenduristiyê jî kir. Ji ber ku ava vexwarinê ji ava Çemê Firatê peyda dikirin, niha ji ber vê kêmkirina avê, nexweşî jî rûdan. Di demên dawî de her çû gelek nexweşî derketin holê tenê di nava du rojan de bi sedan kes bi gazinca jehriyê berê xwe dan nexweşxaneyan."

**Binpêkirina peymanên navdewletî**

Di axaftina xwe de Mihemed Şêxo da zanîn ku birîna vê avê ne li gorî tu qanûn û hevpeymanên navneteweyî ne û wiha domand: "Di tu qanûn û hevpeymanên navneteweyî de hovîtiyeke bi vî rengî tune ye ku avê li ser welatekî qut bikin. Ev yek jî rê û rêbazeke tunekirinê ye. Ev kiryar jî wek kiryarên derbaskirina sînoran, şandina çeteyên ji welatên cuda cuda yên Tirkiyeyê ne. Tirkiye çawa ku di hemû êrîşan de hevpeymanan bin pê dike heman rêbazê di mijara avê de jî bi kar tîne."

**Bang hat kirin**

Di dawiya axaftina xwe de Mihemed Şêxo bang li hêzên navneteweyî kir ku li hember van kiryarên Tirkiyeyê dengê xwe derxin û axaftina xwe wiha bi dawî kir: "Herî dawiyê jî propagandaya ku Tirkiyeyê av berdaye ji aliyê gelek kesan ve hat belavkirin lê ev yek ne rast e. Ev nêzî 4 mehan e bi ciyên eleqedar re me pêwendiyên xwe danîne lê heta niha jî ava çem nehatiye berdan. Ji bo vê yekê jî em niha bangê li hemû derdorên navneteweyî dikin ku sînorekê ji van kiryarên dewleta tirk re deynin. Da ku koçberî li ser vê axê pêk neyên û nebin sedema tofanên mezintir. Ji ber ku her diçe hejmara kesê bi ava golan bi jehrî dibin, zêdetir dibe. Bi awayekî lezgîn çi dikeve ser milên hêzên navneweteyî hewce ye bikin."



# Macron: Li Ruandayê berpirsyariyên me hene

Li Ruandayê di sala 1994'an de di navbera tutsî û hutuyan de şerê etnîkî rû da. Hikûmeta hutu û mîlîsên wê di navbera mehên nîsan û tîrmeha 1994'an de ango di 100 rojan de 800 hezar kes kuştin. Li gorî daneyên Fona Alîkariya bi Zarokan a Neteweyên Yekbûyî (UNICEF) 300 hezar jê zarok in û piraniya wan bi lêxistinê hatine kuştin.

Di ser Qirkirina Kîgaliyê re 25 sal derbas bûn. Gelê Ruandayê ev êş ji bîr nekirin û 7'ê nîsanê ku destpêka şer bû, wekî roja qirkirinê bi bîr tînin.

Têkildarê Qirkirina Kîgaliyê Serokkomarê Fransayê Emmanûel Macron axivî û wiha got: "Ez hatime berpirsyariyên me qebûl bikim."

Emmanûel Macron îdîa kir ku Fransa ne şirîkê sûc e û ev tişt anî ziman: "Demek e dirêj ji dêlva lêkolîna rastiyê, bêdeng ma. Îro bi hurmet li ba we me û hay ji berpirsyariyên me çêbû. Naskirina paşerojê di heman demê de tê wateya domandina peywira edaletê."

**Berpirsyariyên Fransayê**

Li gorî Macron Fransa di qirkirinê de nebûye şirîkê sûc lê ji ber rola Fransayê ya beriya qetlîamê, dema qetlîamê û piştî qetlîamê, vê rolê têkiliyên di navbera her du welatan de diyar dikir. Di navbera salên 2006 û 2009'an de di navbera Parîs û Kîgaliyê jî têkiliyên dîplomatîk hatibû qutkirin.

Di meha adarê de dîroknasên ku Vîncent Dûclert pêşiya wan vekiribûn, raporek amade kiribûn û di raporê de qala berpirsyariyên giran ên Fransayê hatibû kirin. ***RUANDA***

# NY têkildarî şerê Hamas û Israîlê dest bi lêpirsîna sûcên şer kir

Piştî şer û pevçûnên giran ên 11 rojan hefteya borî di navbera Israîl û Hamasê de agirbest hate ragihandin.

Konseya Mafên Mirovan a Neteweyên Yekbûyî ragihand ku têkildarî şerê di navbera Israîl û Hamasê de dest bi lêpirsîneke navneteweyî kirine û destnîşan kir ku di lêpirsînê de wê li binpêkirina mafên mirovan ên li her du aliyan bên lêpirsîn.

Têkildarê mijarê Komîsera Bilind a Mafên Mirovan a Neteweyên Yekbûyî Michelle Bachelet axivî û wiha got: "Êrîşên hewayî yên Israîlê yên li ser Xezayê dibe ku tê wateya sûcê şer. Ji ber ku bêyî cihêkarî bê kirin sivîl hatin hedefgirtin."

Bachelet bal kişand ser daxuyaniyên Israîlê ku digotin wan hin tedbîr wergirtine û ev tişt anî ziman: "Êrîşên hewayî li herêmên sivîlan hatin kirin û di encamê de gelek sivîl mirin û gelek jî birîndar bûn. Êrîşan her wiha cih û warê sivîlan hilweşand."

Bachelet diyar kir ku roketên ji aliyê Hamasê ve hatine avêtin li qadên leşker û sivîlan hatiye xistin û ev yek jî binpêkirina peymanên mafên mirovan ên navneteweyî ye.

Di encama dengdayîna li Civata Giştî ya Neteweyên Yekbûyî de, lêpirsîn divê ji aliyê komîsyoneke navneteweyî, timî û serbixwe ve bê meşandin.

Wezîfeya komîsyonê di heman demê de ji lêkolînkirina sedemên şerê dawî bêhtir lêkolînkirina dema bihurî ye. Komîsyon wê di asta olî, etnîkî, radîkalî û neteweyî de lêkolînan bike. ***NEW YORK***





Xweşkanî

Felemez Ulug

# Dewlet û mafya

Serçete Sedat Peker bi rêya dîmenên li ser înternetê belav dike, têkiliya dewletê û mafyayê radixe ber çavan. Di beşa dawî ya dîmenên xwe de Peker balê dikşîne ser sûcên dewleta tirk ên li Kurdistanê pêk anîne. Di mikurhatinan de tê gotin Suleyman Soylu û Mehmet Agar serkêşê van sûcan e.

Salên 90'î bi bilindûna têkoşîna azadiya Kurdistanê re, li Tirkiyeyê têgeha dewleta kûr ket rojevê. Bi vê pergala ku bi hevkariya artêş, MÎT û JÎTEM'ê pêş ket dihat xwestin pêşî li kurdan ango pêşî li Têkoşîna Azadiya Kurdistanê bê girtin.

Bi destê vê koma çete ya dewleta Tirk li Kurdistanê di gelek bûyerên narkotîk, revandin, kuştin û sûîkatê çêbûn. Bi taybet ev pergala qirêj di serdema Tansû Çiler, Dogan Gureş û Mehmet Agar de pêş ket. Rejîma AKP-MHP'ê jî li Kurdistanê bi haman şêwazî tev digeriya.

Ferqa di navbera AKP û pergala salên 90'î ew bû ku Erdogan û ekîba li derdorê veşartî, bi awayekî hosta tev digeriyan. Hevkariya xwe ya bi serçeteyan re li ser vê têgehê kûr kir û bi rê ve bir. Serçeteyê bi navê Sedat Peker yek ji van kesan bû. Lê bi demê re berjewendiyên wan hev negirtin. Ev jî bû sedem ku Sedat Peker êdî bibe yekî ji rêzê ango bibe yekî dijî têgeha li ser postê desthilatê ye.

Desthilatdariya şer li dijî Sedat Peker da destpêkirin û xwest bi her awayî wî bêbandor bike. Li ser vê yekê Serçete Sedat Peker jî vala nesekinî û ji 2'ê gulanê vir ve bi rêya dîmenan, çeteya di nav rejîma AKP-MHP'ê de xal bi xal eşkere dike.

Di vê mikurhatinê de mijara sereke ya Peker, wezîrê karê hundur Suleyman Soylu bû. Lê bi demê re yek bi yek navê ekîba li derdora wî jî eşkere kir. Di beşa dawî ya mukirhatinên xwe de Sedat Peker pêwendiyên di navbera siyaset, dewleta kûr û mafyayê de raxistin ber çavan. Vê carê Sedat Peker mirovê herî nêzî Erdogan xist nava lîsteya sûcdar û bazirganên narkotîkê.

Ew jî serokwezîrê berê Bînalî Yildirim bû. Di vê mijarê de wî kurê Bînalî Yildirim, Erkan Yildirim weke rêvebirê vî karî nîşan da. Peker eşkere kir ku Erkan Yildirim ê xwediyê bi dehan keştiyî, beriya demekê ji bo bazirganiya narkotîkê çûye serdana Venezuellayê.

Çûyina Ekrem Yildirim ya ji bo Venezuellayê jî bi ticareta kokaînê ve girê da û got: "Berê kokaîn di ser Kolombiyayê re dihat. Piştî ku hezîrana par derdora 5 tonan hate girtin, rêya vê bazirganiyê hate guhertin. Ji bo vê kurê Binalî Yildirim, Erkam Yildirim çileyê Îsal çû Venezulla û 4 rojan li wir ma."

Sedat Peker da zanîn ku Erkan Yildirim gelek caran çûye Qibrisê û li wir Halîl Falyali vê xebat kordîne dike. Di vî warî de jixwe dostaniya Erkam Yildirim û Suleyman Soylu tê zanîn. Peker di dewama dîmenên xwe de hişyarî da û da diyarkirin ku eger zextên li hemberî wî dewam bikin, ew ê di rojên bên de asta herî bilind a sûcên Soylu û kesên derdora wî eşkere bike.

Di vîdeoyê de Peker dibêje "kujerê rojnamenavan Ugur Mumcu, Mehmet Agar bi xwe ye." Li ser mijara cinayetên ku di salên 90'î de li Kurdistanê jî Peker dibêje "bi fermana Agar, karsazên Kurd dihatin kuştin."

Ji ger ku li Tirkiyê hiqûq û kanûn nîne kesên ku wekî van tawanan tên darizandin jî îro di asta herî bilnd de di nav rejîma AKP-MHP'ê de cîh digirin. Nakokî û pevçûnên di nav van komên çete de rûyê rast û desthilatdariya Tirkiyê radixe ber çavan.

# Li dîasporayê derûniyê bindestiyê

Azad Kurdo

Piranî kurdên ku li Almanyayê dijin zarokên wan bi kurdî nizanin. Bi zarokên xwe re bi zimanê tirkî diaxivin. Di televîzyonê da jî bi piranî fîlm û nûçeyên tirkan dişopînin. Her wiha rêjeyekî mezin jî ji xwe re dibêjin em tirk in

Başî jî xerabî jî tev bi perwerdehiyê derdikevin holê. Mirov çiqas bi perwerde bibe ewqas pêş ve diçe. Êdî bi awayekî berfireh dikare bifikire. Perwerdehî ne tenê ew e ku mirov biçe zanîngehê û beşekî bixwîne û bawernameyekê werbigire.

Perwerdehî zanîna dîrok, çand, huner, ziman û kevneşopiyê ye. Mirov dema dîroka xwe bizanibe bala xwe dide ziman, çand, huner û kevneşopiyên xwe jî. Ev jî hişmendiya netewebûnê derdixe holê. Mînak eger mirovek xwedî hişmendiya neteweyî tiştekî biafirîne, ew kes ji gelê xwe re dibe pêşeng û mînakeke mezin. Nifşên nû jî ji pêşengên xwe bandor werdigirin û li ser hişmendiya neteweyî dimeşin. Lê ew hişmendî jî bi piranî bi saya dewletê xurttir dibe. Lewre eger mirov xwedî dewletekî be, mirov ji xwe bawertir dibe, xwe ewlekar hîs dike, bi saya hîskirina ewlehiyê jî meriv dest bi afirandina tiştan dike. Digel vê yekê jî mirov dixwaze pêş ve biçe û zanîna xwe zêdetir bike.

**Bindestî û penaberî**

Lê belê mirov ji sedî sed van tiştan nikare ji bo gelê kurd bibêje. Gelê kurd her tim di axa xwe da bindest û penaber bûne. Ji ber vê yekê têkoşîna me ya herî mezin jî rizgarkirina jiyana me bûye. Vê bindestbûnê jî derûniya me gelekî serûbinê hev kiriye. Bi sedema wî em nikarin di welatên azad de jî kordîne bibin û hebûna xwe birêxistin bikin.

**Li Almanyayê rewşa kurdan**

Lê ev nayê wateya ku ji sedema bindestiyê kurd dê nikaribin tiştekî bikin. Ji bo mînak rêjeya kurdên ku li dîasporayê dijin gelekî zêde ne. Bi taybetî jî li Almanyayê rêjeyeke mezin ya kurdan heye. Bi qasî ku tê gotin tenê li Almanyayê ji milyonekî zêdetir kurd hene. Her wiha piraniya wan edî bûne niştecihê Almanyayê. Di heman demê de gelek kes hene ku li vir ji dayîk bûne û hemwelatiyên Almanyayê ne. Ev kes xwedî nasnameya Almanyayê ne. Dikarin ji her tiştî îstîfade bikin.

Mînak dikarin partiyeke siyasî ava bikin, di hilbijartinê da ray bi kar bînin, saziyekê vekin, di karên fermî da bixebitin, mamostetî an jî bijîşktiyê bikin, dikarin bibin namzet ji bo parlementeriyê û hwd. Bi kurtasî ji hêla fermî ve ji bo her tiştî azad in. Lê dîsa jî nikarin di nav siyaseta Almanyayê çalak bibin. Di heman demê de nikarin parlamenterekî kurdewar jî derxin. Ne tenê di siyasetê de, di jiyana rojane de jî ne çalak in. Tenê li Berlînê bi piranî bazirganên mezin kurd in. Lê dîsa jî nikarin yekîneyekê ava bikin û hebûna xwe nîşan bidin.

**Piraniya zarokan kurdî nizanin**

Piraniya kurdên ku li Almanyayê dijîn zarokên wan bi kurdî nizanin. Bi zarokên xwe re bi zimanê tirkî diaxivin. Di televîzyonê de jî bi piranî fîlm û nûçeyên tirkan dişopînin. Her wiha rêjeyeke mezin jî ji xwe re dibêjin em tirk in. Ev jî sedema nezanî û perçebûnê ye. Ger gelê me bi perwerde bibûna û zarokên xwe jî bi perwerde bikirana niha kurdên dîasporayê gelekî bi hêz û qewet bûn û di nav siyaseta Ewropayê de dikaribûn çalak bibûna û xwe birêxistin bikirana.


**Nifşên nû û jiyaneke kurdewar**

Ji bo ku kurd bikaribin li derveyî welat çalak bibin hewce ye ku rêxistinên kurd ji bo yekitiyê zêdetir hewl bidin. Ji taybetî jî pêwist e ku gelê kurd ji derûniya bindestiyê derkeve û piştgiriya rêxistinên xwe bike. Bi xilasbûna ji derûniya bindestî sazî û dezgehên kurdewar ava bikin û yên heyî jî xurttir bikin. Em dikarin bi jiyaneke kurdewar xwe bigihînin nifşên nû û wan rizgar bikin.

**Welatê azad û statû**

Zarok û ciwanên me yên li dîasporayê ji aliyê çand, ziman û hestên kurdewar ve ber bi tunebûnê ve diçin. Divê sazî, rêxistin û dezgehên me bala xwe bidin pirsgirêkên ziman, çandî û hunerî. Gel bi zimanê xwe hebûna xwe nişan didin. Divê em her kurd di vê hişmendiyê de be û ji qewmên din zêdetir bixwîne û ji derûniya bindestiyê xelas bibe. Ji ber ku derûniya bindestiyê li ser me ye, em ne dikarin welatê xwe azad bikin ne jî dikarin di welatên azad de bibin xwedî statuyekê.



Ji Delav

Feratê Dengizî

## Tolik

*Girêsîran bi sîr a lê lê lê lê Meyro*
*Gîrxopanê bi sîra tolikvanê Meyro*
*Van siwaran hîre hîre lê lê lê lê Meyro*
*Xwestiyê Meyro wezîrê tolikvanê Meyro*

Heta wê rojê min nizanibû tolik tê xwarin, yanî wek xwarinê. Bi zarokî me nanikê wê dixwarin, lê wek pirpar an jî silqok(îspenax) çêkirina wek aşêxwarinî min nedîtibû.

Dema tengesirî, fermandarê yekîniyê ez û hevalekî nexweş peywirdar kirin ku em tolikê bi hev din. Hela, hela... Kerekî me yî henûn jî hebû li gel hespekî. Me têrek avêt ser kerê û me da rê. Hevalê min devera tolikê dizanibû.

Heyirî bûm, bipirsim an na! Cahiltiya xwe ya di vî warî de jî veşêrim nabe. Heta vî emrî çawa ez nizanim ku tolik aş e! Lê va wisa ye.

Dûrika Meyremxan ket bîra min. Himm, her wiha bi rastiyekê re rû bi rû me. Warê ku em çûnê gova şivanan bû. Şikeftên zêde, zibil û tolika zêde. Me barek tolik da hev. Îca qelandina wê, şorbeya wê, wek ku fermandarê heremê got; "em pê virikî" bûn.

Jiyan wisa ye. Niha zêdeya wan cangorî ne. Ligel ku em gelek rastiyan ji wan hîn bûn, ev bîranîn her dem dilê min têşîne. Carinan ji bo rêzdariya wan em li malê tolikê çêdikin, ma îsal jî rijiyaye ha...

Girêdayî vê dilêş û rêzdariyê di vî temenê dirêj û mişt bobelat de, rastiyek xwe rû dide. Jiyan ji me Kurdan re pir giran û buha ye. Tiştekî ji xelkê re ji rêzê, ji me re bi berdêla xwîna ciwanan û cangoriyan e. Li vê xakê tu kîjan kevirî bileqînî xwîn diherike. Dar û ber tev bi xwînê aj didin. Di civakê de her nirx û bideskeftiya me zêde buha û giran li ser me rûniştiye. Bi nasnameya xwe ya Kurdewar tu nikarî bibî Keyayekî jî. Biborin ne ku astê dadixim. Ji bonî fêhmdarî û nirxandinê mînakan didim. Herê, her mirov û asta xebatê û her candar ji min re pîroz e. Lê welehî em zêde êşiyan. Divê mirovahî ewqasî neketa bin lingan. Hovî û neyartiya zordestan hestên me jî xeritandin. Bindestî û zordestî tu dibejî qey jiyana me ye. Herê delalino, wele bindestî, nîrê bindestiyê zedê zor e lo... Herê *"teori rengxwelî û jiyan kesk e"* wek ku şoreşgerê mezin gotiye.

Lê dil ewqas hovîtî, bêrêzî, zordestî û neheqiyê ranagire.

Helepçe, Geliyê Zîlan, Geliyê Godernê, Girê Şêran, Nisêbîn, Sûr, Cizîr, Efrîn... Hayho hawar e. Ev çi nifir li me bûye. Genîtiya edoqewm û xwefiroşan ya kurmên darê li aliyekî, li aliyê dine Şingal, Kerkûk, Mehabad, jidestçûna şaredarî û saziyên Kurdî, girtina şaredar û parlamenteran û xwîna ciwan li gel lehengî û serhildêran.

Jiyan çiqas wehşî ye, hov e. Ka mirov, jiyan, hebûn û jiyana ruhberan pîroz bûn! Derewên olî, zanistî, civaknasî.... Ma mirov, rûmet, mirovahî ewqasî dikeve!

De lo, dile min ji mirov dixele êdî, biborin...

Aax dilê min. Me ji zaroktî, ciwanî û navseretiyê, xwe bi nirxên mirovîn girêda, hê jî...

Lê jiyan, rastî, rasteqînî. Heqîqet, ka heqîqet! Ne wijdan, ne mafdarî, ne jî edalet heye. Nexwe rastî û jiyan ev e! Xwedêkirî ku berxwedan, berxwedan û parastina heqîqet û mirovahiyê ya parastina candarî , Xwezayî û Gerdûnî heye..


Belê, em evîndarê hêviyê ne.

Ma ne Zardeştê hemdem dibêje;
*"Hêvî ji serkeftinê birûmet-tir e."*

Belê em rêwiyê heqîqetê û azadiyê ne...

Ligel hemû kul û kederan, bi silavên ruhşadiya cangoriyan;

*"Girêsîran bi ce ye lê lê lê lê Meyro*
*Gîrxopanê bi ce ye tolikvanê Meyro"*



# Demhilatdarî

Vedat Ataş

Mirovahiyê veguherînên xwe yên herî lezgîn di serdema dawî de pêk aniye. Di demeke kurt de jiyana xwe ji binî heta serî nû kiriye. Jiyan, veguherîn û mirovahî; pirsa herî kevn ango hebûn û tunebûnê ji me re dike diyarî. Her çiqas Decart gotibe "difikirim wê demê ez heme" jî ev bersiv bi xwe re deriyên lêpirsînên bingehtir ji me re vedike. Mînak, berî ku em nedifikirîn çi diqewimî? Jiyan çawa bû? Em ji ku derê hatin? Her tişt çawa çêbû? Her kes di jiyana xwe de herî kêm carekê nêzî van pirsan veniştiye û bi bersivên rengorengo dengê xwe gihandiye nifşên nû. Ev kar ji bo hin pergalan sermiyanekî ava dike. Îro em dikarin bêjin ku du beş berpirsiyartiya vê dozê dike. Ol û zanistî. Li gorî hemû olan nav cuda bin jî xwedayekî newaze destpêkê xwe paşê jî feza, gerdûn û hemû zindiyan afirandiye. Ji aliyê din zanist bersiveke cuda dide. Ez ê bi zanebûnî li ser zanistiyê bisekinim. Bi vî awayî wê dilê guhdarvan an jî xwendevanan ji mejiyê wan hindiktir bişkê.

Lêkolînên fîzîkê teoriyeke bi navlêdana Bîg Bangê ji dara jînê weşandiye. Li gorî vê teoriyê jî nêzîkî 13-14 milyar sal berê bi vê teqîna me ya navdar; feza, hêz, dem û hin element derketine holê. Di fezayê de bi derbasbûna demê ve ji hêz û elementan hin avahiyên mezin û tevlîhevtir yên bi navê molekul çêbûne. Ev jî dikeve beşa kîmyayê. Di vê navberê de teqîn bi awayekî ji ya destpêkê biçûktir didomin. Bi vî awayî stêrk û gerstêrk çêdibin û li ser gerstêrka me bi tekiliya molekulan jî organîzma çêbûn. Beşa bîyolojiyê organîzma û jiyanê bi me dide fahmkirin. Jiyana mirovahiyê jî bi saya dîrokê digihêje me.

Dîrok bi sê şoreşên mezin tê ber me. Nêzîkî 70 hezar sal berê bi bersivên pirsên mirovan çandek derket holê. Girêdayî vê çandê jî hin alav hatin peydakirin. Ev wekî şoreşa pevnasîn dikare bê binavkirin. Bi destpêkirina bikaranîna van alavan jî 12 hezar sal berê şoreşa çandiniyê dest pê kir. 5 hezar sal berê jî bi destpêkirina nivîsa bi rêxistinî şoreşa zanistiyê rêvebirina civakê mîsoger kir.

Her çiqas Samuel Noah Kramer gotibe jî "dîrok bi sumeran dest pê dike", pêşî em ji bo lêkolînên wî spasiyên xwe lê dikin; paşê jî em dikarin bêjin ku dîrok berî sumeran dest pê dike. Ji ber ku mirov yan jî yên ku pir dişibin mirovan heta berî niha 2.5 milyon sal berê jî hebûn. Em dikarin bêjin nîv milyon sal mîna ajalan maye. Pêşketinên mezin pêk neaniye. Lê belê 1.7 milyon sal berê hûn li botanê bigeriyana we yê dîmenên nas bidîtana. Ji zarokên digirîn bigirin heta kal û pîrên bi ciwanan dixeyîdin hemû jî hebûn.

# Şerê arizî û pergalê Tirkîya

Murad Tunekragij


Rojeva ma nê deman de serobin bîya. Yew hewteyo ma televîzyonan de medyaya sosyale de rojnameyan de kure ra bewnê qala mesajanê Sedat Pekerî beno. Ma zî kewtî na gindale mîyan û şonê. Na meseleya sîyasetî ya. Cayo ke merdim nêeşko rojeva xo awan bikero sewbîna hêzî rojeva to bewlî kenê. Tirkîya de yew hewte, des rojî yo ke ma nê halî de yê. Sîyaset, komel rojeva Pekerî dima şonê. Her kes tira çîyêk paweno. Na mesela ajandaya her kesî sewna ya. Hima her kes paweno. Se beno, çi beno ser fikirîyeno. Ge-ge no çi tofono vanê, ge-ge zî vanê na operasyon ra pey beno ke tay çîyê rindî bibê. Hima mesela raşta no hewa ya? Hêzê ke na mesela ser şîrove kenê, rojeva şarî ra zaf dûrî yê. Çina ra? Hima vîdeoyanê Pekerî ra teber çi orte de çînîyo. Ma ewnîyenê tay rojnameyan; 'Komelo pank' ra behs kenê. Na polîtîka polîtîkaya dewlete ya. Hima binê na polîtîkaye de yew mesaj esto. Teslîyê şarî nê îqtîdarî ra kewta. Çew tira çî nêpaweno. Ez vana qey ma na dahkara de sey yewbînan fikirîyenê.

Kenê ke şarî ancina definê pawitişan mîyan. Şar raşta zî paweno ke na mesela hal biba. Tira pey tay zî bibo dewlete pank ba. Hima gişta dewlete na dahkara de zaf leymin a. Na dewlete çend serrî yo ke yew şerê gemarinî ramena. Zaf gemarin a, zaf leymin bîya. Na sebeb ra bi asanîye pank nêbena. Raşta ci serdestê Tirkîya nêwazenê na dewleta leymine bibedilîya. Çimkî bedilîyayîşê na dewleta leymine mergê serdestanê Tirkîya yo. Na leymine, nê şerê bêehlaqî çend serrî yo verba Kurdan de ramena. Nê hêzî şerê arizî (Şerê Taybet) mîyan de aver şiyê. Ewro nê şerê arizîyî yew hetî ra hem verba Kurdan danê û yew het ra zî nê şerê arizîyî Rojhelatê Mîyanênî de verba şaranê bînan de danê. No hewa bîyo ke mafya herinda ê dewletan girewta û dewletî bîyê mafya. Merdim nêeşkeno înan wirdînan yewbînan ra cîya bikero. Na mesela meselaya pergalî ya. Pergal pêro zî no hawa bîyo. Na sebeb ra ê ke na mafya reyde tekoşîn danê ganî dewleta leymine reyde tekoşîn bidê. Heta mesela dewlete nêşêra sere meselaya mafya zî nêşona sere. Wirdî kewtî têmîyan. Na sebeb ra ganî ma şerê arizîyî (Özel savaş) hewl bîzanê û fehm bîkerê.

Şero arizî ewro verba şaran sewbîna tewir yeno ramitiş. Çina ra? Dewleta kapîtalîst, hêzê kapîtalîst modernîteyî zanê ke verba şaran heta ewro çi rayîr esto se hetê înan ra ameyo ramitiş. Na sebeb ra Şerê Dînyaye yê Diyînî ra pey ewnîyayê ke verba şaran çixaran xo nî ke dewam kenê nê rayîr şerî, şarê mîyan de bîyê eşkera înan reyde nêeşkenê şêrê aver, sere de no şero leymin verba şaran dayo. 1945 ra peyî hemê çîyê şerî bedilnayê. Heta o waxt no rayîr armancê nê hêzan nêbî. Semedê vînayîşê karê xo yew hacet bî. Hima tira pey na hacet bî armancê nê dewletan. Şerê arizî waxt mîyan de no hewa yew hal girewt ke boy da. Komel mîyan de cergî (çeteyan) sey dewlete têgêrayî, warişt û ronîştî. Na mesela no hewa yew hale girewt ke pergal bî rejîmê şerê arizî. O waxt ra pey dewlet û çeteyî bîyê seyyewbînan. Ewro serdestê Tirkîya nê halî mîyan de yê.

Rejîmê Tirkîya bîyo rejîmê şerê arizî. Ti hetê leyminîye ra, bêehlaqîye ra, bêqanûnîye ra, ti çîna bigêrî ti eşkenê bivînî. Na leyminîye verba Kurdan de hîris serr şer dayo serdestanê Tirkîya. Tira pey AKP ke ameye îqtîdar seke demokrasî do bîyara Tirkîya hem şarê xo hem zî şarê bînî xapînayî. Yew hetî ra şoreşger, heskerdoxê demokrasî, lîberal û dinya pêro girewtî xo het û yew hetî ra zî seke çeteyan rê operasyon virazena, xo wina mojna. Bînek serkewt zî. Hima derdê ci sewbîna bî. AKP qet nêwaşt nê çeteyan werte ra hawana. Ameyîşê îqtîdarîya xo de nê çeteyan reyde ameye têhet. Înan zî waştêne ke dewleta xo ya xorîne awan bikerê. Kerd zî. Ma zî na mesela de xapîyayê. Roja ke ameye îqtîdar, dest bi karî kerd nê çeteyî semedê xo weye kerdî. Ê semedê xo xebitnayî. Hetêk ra zerre de çeteyê sey Peker û Çakiciyî xebitnayî. Hetêk ra vengê merdimanê demokrat û mahalîfan pê gefan birna û dewleta xo ya xorîne awan kerde. Dewlete bî dewleta AKPye. AKP bî dewlet. Çeteyanê ke şerê arizî yê leyminî de verba Kurdan şer kerd, ê bîyê wayîrê AKP û bîyê wayîrê dewlete. No hewa yew proses de çew nêeşka nê çeteyan rê çî vajo. Kam ke çî va, çeteyan înan rê gef wend û gale kerd sereyê înan.





Ewro pergalê AKP-MHPyî zaf tengayî de yo. Bado ke kewtî tengayî dest bi werdîşê yewbînan kerd. No werdiş, werdê ke ma zanê no hewa yew werdiş nîyo. Pergalê ke bikewê tengayî, kam ke dormarê pergal de gêreno ê zî kewenê tengayî. Na yew dîyalektîk a. O waxt ê ke werte de wenê û gêrenê kewenê têmîyan. Çina ra katê înan kêmîyeno. No hewa prosesêk de sey Pekerî merdiman wecenê werte. Nê hêzê ke pergal ra weye benê, na saete ra pey wazenê ke heme çî wa yê înan bibo. Yew çî manê kenî. Kewenê têmîyan. Ewro zî no hewa bîyo. Kewtî têmîyan. Şima name na mesela çina ronênê bironê. Beso ke şima na mesela ra nêvajê meseleya 'Komel pank o'.

Na mesela heta key dewam kena bewlî nîya. Hima aseno ke nê klîkî hema yewbîn de zaf danê û gênê. Nê klîkan ra yew şono. Na mesela hîn eşkera ya. Hima bewlî yo ke na mesela de Peker tena nîyo. Beno ke hêzê navbeyna mîletan zî paştî danê Pekerî. Danê zî. Na hetê her kesî ra yena zanayîş. Hêzanê Kapîtalîst Modernîteyî hema destê xo AKP û R.T.Erdoganî ra kaş nêkerdî. Wazenê ke nê îtîfaqê AKP-MHPyî bibedilnê. Hima lingê xo pît nêdanê erdî ro. Hima pawitişê înan nê îqtîdarî ra esto. Hetê bînî ra nêwazenê pergal zaf zî bîcîwîyo. Na sebeb ra paşt danê nê çeteyan. Hima çew karişê dewleta xorîne nêbeno. Ewro ra nê rayîrî ramenê. 96î de Susurluk de na sîyaset, no rayîr temaşe kerd. Kesê ke orte ra hawana hawana. Pergal seke xo pank bikero, rayîrê xo dewam kerd. Ewro rejîm bîyo rejîmê şerê arizî. Yewbînan benê, anê û çarnenê hima çîyêk nêbeno na dewleta leymine. Kesê ke şî şono. Pergal xora kesan dima nêşono. Semedê pergali kes estê. Heta ke pergalî rê benê ercîya yê. Roja ke pergal rê nêbê, yan zî nêbîyê se karê ê kesan zî qedîyeno. Kişenê. Sewbîna yew çî anê înan sere. Ewro sey na mesela ameya serê Pekerî. O zî mesajanê xo de keno ke yew hetî ra xo bipawo, yew het ra zî heyfê xo bigêro. Çimkî xo wayîrê dewlete vîneno. Vano; mi heta ewro paşt da dewlete. Waxt ame ez qîraya merdiman ser o, waxt ame mi merdimî kiştî, ez semedê aye zîndan rakewta. Waxt ame ez heme çî ra vîyarta. Ez wayîrê na dewlet a. Tayê bêneseb ameyê mi ra vanê se. Neheq o? Nê. Çimkî ê ke verba înan vinderto raşta bênesebo. Na dahkara da sewbîna çî vatiş suçdarî ya. Hima heta vizêr wirdî birayê yewbînan bî. Ewro nê hetî ma ra bêqîymet ê.

Ganî ma hetêk ra nê şerê leyminî temaşe bîkerê. Hetêk bînî ra zî ganî ma na rojeva ra xo bixelesnî. Na rojev dewam bîkera se ma mîyan de fetisîyenê. Çimkî dişmen verba Kurdan de şerê xo yo arizî, leymîn, gemarinî hergo roje bînêkna aver beno. Ganî ma na mesela baş bizanê û gurebî aye gamanê xo bierzî. Wa ameyoxê şima nê şerê leyminî ra durî bo. Bimanî weşîye de.

# Qetlîyamê Çorumî sero ra 41 serrî derbaz bî

Merkezê Xeberan

Qirkerdişê Çorumî yo ke 28ê menganê Gulane û 4ê Temmuza 1980î de bi siloganê 'Gonî rê gonî heyfgirewtiş, gonîya ma birija zî serkewtiş yê Îslamî yo' vera mehleya Elewîyan ame destpêkerdene de goreyê doyeyanê fermîyan tewr tay 57 hemwelatîyê elewî ameyî qetilkerdene û bi seyan kesî zî birîndar bibî. Qirkerdiş nizdîyê yew aşme û nîme dewam kerdbî. 300 ra zêde kesî birîndar bîyî û 300 ra zêde keye û dikanî zî ameybî texrîbkerdene.

Qirkerdiş 28ê Gulana 1980î de badê mergê Wezîrê MHPyî Gun Sazakî Çorum de hetê nijadperestan ra dîyabî dest pêkerdene. Labelê şar bi tesîrê Qirkerdişê Mereşî vera hêrişan de xopawitişê meşru xebetna û barîkatan rona siqaqan. Neticeyê xopawitişê meşru de aye roje hêrişkarê nijadperestî nêrasayî armancê xo.

1ê Temmuze de nijadperestî reyna hêriş pê ardî û ca-ca xoverdayîş virazîya. Nijadperestî eştî keyeyanê elewîyan sero û netîce de 4 kesî ameybî qetilkerdene. 2ê Temmuze de Çorum de serê sibayî saet 06.00î ra tepîya qedexeyê tebervejîyayîşî ameybî îlankerdene.



Her çiqas ke 2 û 3 temmuze de qedexeyê tebervejîyayîşî bibo zî nijadperestan bi bombe û çekan hêrişanê xo domnayî. Nê hêrişan de zî 3 kesî merdî. Nê 3 kesan ra di tenî serê rayîrê Îslîpî de merde ameyî vînayene û kesêk zî dewa Hisarkavakî de ame kiştene. Demê qedexeyan de taxa ke sey qerargahê nijadperestan ameyêne zanayene de qet asayîş çinî bî û cigêrayîş tîya de nêameyêne kerdene.

Hêrişo gird 4ê temmuze de bi çekanê menzîlanê dergan û bombeyan virazîya. Tîya de ame waştene ke qetlîyamê diyîne ê Mereşî bêro viraştene. Çorum bibî sey raşteyê şerî. Na roje zurêka sey 'Taxa Mîlonu de Caamîyê Alaaddînî ameyo bombardumankerdene' ame eştene. Her çiqas ke muxabîrê TRTyî vajo ke na xebere mi nêviraşto zî çimeyê xebere TRT bî. Sey na xebere xeylê xeberê zûrî û bêesle virazîyayî ke nijadperestî deşarj bibî û biherikî raşteyan. Goreyê doyeyanê fermîyan qirkerdişê Çorumî de tewr tay 57 hemwelatîyê elewî ameyî qetilkerdene û 300 ra zêde keye û dikanî zî ameybî texrîbkerdene.






# Tiştanok (mamik)

Me dîsa ji we re çend tiştanok ango mamikên xweş amade kirine . Bi hêvî me ku bi dilê we be. Her wiha em dixwazin hûn ji kerema xwe tiştên li ba xwe binivîsin û ji me re rêkin E-maila rojnameyê da ku em wan jî biweşînin.


**1-**Tiştek min heye
Çûme çolê çol beyarkî
Heft dûv li pey beranekî
De bêjin ew çi ye?"

**2-**Tiştek min heye
Ez çûme êş
Ezabek hate pêş
Bi heşt lingan
Ji xeynî kelêş

***çavkanî: Mamikên Botanê***
***berhevkar: Rênas Xendekî û Dildar Botî***

**Bersivên me ev in:**
**1-**Lema zebaşan **2-**Kevjal

# XAÇEPIRS



**JI ÇEPÊ BER BI RASTÊ**

3. Ne berdest, ne nêzîk 5. Baneşaneke dilxweşiyê
7. Ji boyî çi 8. Agir 9. Wêjeyî 13. Neteweya herî zêde li Rojhilata Navîn
14. Darê ku davêjin ser pişta gayê cot 16. Irq û koka hin gelan ku kurd û faris jî di nav de ne 19. Tiştê baş, çê, kêrhatî 20. Noteke Mûzîkê
21. Xemla ku jin di çavê xwe didin 22. Ji nişkan ve25. Dayik
26. Dengê karikan, an jî hatina baranê ji jor ve 28. dilgirtî, heskirî

**JI JOR BER BI JÊR**

1. Derketina ji ber şer an jî bi darê zorê ji cih û warê xwe 2. Rê, rêbaz, rêçik
3. Ji bo 4. Bazdan
6. Zimanê Quranê
10. Bersiva erênî
11. Kesê ji Îtalyayê
12. Ber, cebhe
15. Heq
17. Dengê Çêlekan
18. Qanaleke avê ya Misrê ku herî zêde gemî tê de derbas dibin
20. Şerm
23. Vê carê
24. Çêlîka biznê, an jî feyde û sûd
27. Kurtahiya navê Neteweyên Yekbûyî

## Bersiva hefteya borî






Kewê Redkan

# Konê bêderî

Ez zarok bûm, na, na ez ne zarok bûm, hema pêda pêda ber bi temenê qîzeke xama ve diçûm. Malbata diya min hemû jî bajarî bûn, ne wek me koçer bûn. Ew di xaniyên mezin de dijiyan û li der û dorên wan heywan tune bûn, lê jiyana me ji bo wan wek jiyaneke egzotîk, romantîk û azad xuya dikir. Îca her sal dema em derdiketin zozanan, ew malbavanê diya min jî dihatin serdana me, hemûyan jî digot; Ayyy çi jiyaneke xweş, hewayeke paqij, xwarinên ekolojîk, filan û bêvan.

Erê, her xwarin û jiyana me ekolojîk bû, lê de tu were ji me bipirse ka bibîne, dema her yek ji me ewqas çêlek, mîh, bizinan çawa didoşin, çawa şîrê wan cuda cuda dikin penêr, mast û toraq?.

Ev jiyan ji bo min ne egzotîk bû, karekî mezin bû, bi şev dema ku em diketin nava ciyan û me serê xwe dida ser balgiyan, bêhnvedana me jî ew bû. Lê dema ku malbavanê diya min dihatin, wana penêr, toraq, rûnê nîvişk, hingivê çiya, hêkên teze û nanê germ li ber xwe didîtin, ji xwe bi xwe re digotin jiyana herî xweş ev e. Hinek dixwarin, yê mayî jî bi xwe re dibirin, ew diyariya diya min bû. Qet behsa goşt jî nakim, goştê hişk, teze û qelî...

Qîzeke xalê min hebû, pir xweşik û nazik bû, salek an du sal ji min mezintir bû, lê xweşikbûna wê pir bala min dikişand, min tirkî nizanîbû, wê jî kurdî, lê me bi îşaretan ji hevûdu fêm dikir. Min ew li çiya û baniyan digerand, li ser kaniyan, di nava giya û çîmenan de hevaltiya me baş dibû. Şevekê dîsa em hemû ketin nava ciyên xwe, jixwe min digot; hema bila ro here ava, ez jî bikevim nava cî û nivînan û razêm.

Piştî demekê ez bi girî û hilke hilka qîza xalê xwe şiyar bûm, min nizanîbû çi qewimiye lê min dixwest ew dengê xwe bibire û xewa min jî neherimîne. Ji dengê girî û zarîna wê ez nikarim razêm, ne tenê ez, hemû malî li ser piyan in. Keçik dibêje zû derî bigirin, deriyê kon vekiriye ez nikarim razêm, jê re dibêjin; Ev konê hanê û hemû konên li der û doran bê derî ne, keçik serwaxt nabe, derî bigirin ha derî bigirin.

Diya min rabû, hemû lihêfên li ser me rakir û avêt ser kon, nîviyê lihêfan jî ji jêr de daliqand, wek perdeyên herî qalind. ez li orxanên daliqandî dinêrim û li ser cî û nivînan de wek ku tazî mame. Di dilê xwe de wisa hêrs bûme ku, hema wê keçikê bidin ber destê min, ez ê wê bigirim bibim di nava çêlekan de girê bidim. Qet bi tiştekî qayîl nabe, wê dixwaze, vê dixwaze. Dema sibetirê ew bi rê ketin çûn, diya min vegeriya ji min re got; Wexta ku sala dinê ew hatin, tu jî here mala xwişka xwe razê heta ku ew çûn. Diya min dizanî ku min ê çend heb gotin bigotana lewma bêha xwe dabû ku dema mêvanê wê hatin, ez ê jî herim mala xwişka xwe mêvanî. Lê konê xwişka min jî bê derî ye. Min got; Dayê wexta mêvanê te hatin konekî bi derî hazir bike ji wan re. Wê giliyên xwe got ji min re lê destê wê ne gihîşt min... Ji xwe hemû kon bê derî ne....

# Govend û stranên xurfanî

■ Nêrgiz Ismayîl

**Endamê Tevgera Mezopotamyayê Bêkes Darî der barê projeya nû ya bi navê Xurfanî de axivî. Darî bal kişand ser çanda resen a gelan û girîngiya reseniya çandî ya ji bo zanavê gelan...**

Li rojavayê Kurdistanê berhema bi navê stran û govenda Xurfanî tê amedekirin. Ji bo ku em agahiyên berfireh werbigirin em bi Endamê Tevgera Mezopotamyayê ya Çand û Hunera Demokratîk a Rojavayê Kurdistanê – Beşa Stran û Muzîkê Bêkes Darî re axivîn.

Bêkes Darî têkildarî xebatên xwe da zanîn ku herî dawiyê amadekariya klîbekî kiriye û ev tişt got: "Herî dawî amadekariya klîbekê hate kirin, bingeha vê projeyê jî li ser rewşa wan hunermendên ku çûne ser dilovaniya xwe û hetanî niha jî bandora xwe li ser strana kurdî, hunera kurdî hêliştine û di heman demê de mafên wan nehatiye dayîn. Me weke erkekê li ser şanê xwe dît ku em xwedî li van hunermendên me yên resen derkevin. Lewra me hunermend Eyaz Yusif hilbijart ku em jê re şahiyeke rêzdayînê çêkin. Gelek berhemên wî hebûn û zû şehîd bû, bi destê rejîma Baasê ya Iraqê. Gelek stranên wî yên bi nav û deng hene, weke Govend e Govend e û hwd. Rast e me ew şahî pêk anî lê belê paşê em hizirîn ku tenê şahiyeke rêzgirtinê kêm dimîne. Diviya em hîn gaveke din biavêjin."

**Mîrateya kurd û gelan**

Darî axaftina xwe de dest nîşan kir ku herêma Cizîrê ji aliyê çand, ziman û kelepûra gelan ve gelekî dewlemend e û wiha axivî: "Bi taybetî jî rengek ji çandê heye ku navê wê Xurfanî ye. Di dawetan de diyar dibe, stranên ku têne gotin jî taybet in. Stranên Xurfanî hem bi rengê stranê ye hem jî bi rengê govendê ye. Wiha me xwest em bi projeyekê bikin yek. Mînak di vê herêma me de hunermendên ku ev stran digotin hemû jî çûne ser dilovaniya Xwedê. Ew stranên wan jî di kasêtan de bûn, bi rengekî nexweşik hatibûn tomarkirin. Nimûne rehmetiyê Yusifê Çelebî bû, Ehmedê Kinê, Hiznî Bavê Adil bû. Ne tenê ev û gelek hunermendan çanda kurdî, mîrateya kurdî di sînga xwe de hiştibûn. Me got em ê hinekî lêkolîn li ser van stranan bikin."

**Em bi reseniyê neleyîstin**

Endamê Tevgera Mezopotamyayê Darî der barê armanca klîba xwe de diyar kir ku armanc xwedîderketina li çanda xwe ya resen e û wiha domand: "Em erka xwe dibînin ku xwedî li cewhera wan hunermendên xwe derkevin. Min û hunermend Delîl Mîrsaz, me gengaşe li ser kir. Heşt mehan me li ser vê xebatê amadekarî kirin û ev mehek e ku wek klîb xilas kiriye. Di vî karî de em neçar man li wan stranên wan vegerin û baş guhdar bikin. Me xwest di stranan de em bi tu peyvên wan ên resen nelîzin. Lê tenê me xwest em hinekî ji aliyê muzîkê ve nûjeniyekê bidinê. Wiha me peywendî bi gelek hunermendan re danî. Nimûne weke; Şefîq Bavê Re'ad, Selîmê Temo bû, Beha Şêxo bû, Zûbêr Salih, Salihê Heydo bû. Em ji van kesan bi gelekî re şêwirîn. Em bûn çardeh hunermend. Di dawî de em gihiştin wê encamê divê em bi vî rengî çêkin."

**Tenê maye montaja klîbê**

Bêkes Darî ragihand ku ji bo vê projeya xwe şeş stran hilbijartine û ev tişt got: "Me li studyoyê tomar kir. Me komên xwe yên Komîna Govendê jî anîn û bi wan re amadekarî hîn dewlementir bûn. Ji wan re jî spas dikin, ji ber di nava van komên me yên herêma Cizîrê de jî reqsa Xurfanî heye, reqseke cuda ye, giran e û xweş e. Wan jî provayên xwe temam kirin bi cil û bergên kurdî, cilên her çar perçên Kurdistanê li xwe kirin.

Du hunermend ji wan jî Şefîq Bavê Re'ad û Selîmê Temo ne. Ew jî her yek di vê klîbê de stranek gotine. Çardeh hunermendên me jî bi cil û bergên kurdî beşdarbûn. Di 22'yê gulanê de jî me klîba wê jî bi dawî kir. Êdî tenê beşa montajê ya van berheman maye, ew jî dê temam bibe û em ê pêşkêşî gelê xwe bikin."

**Pêkanîna şoreşa hunerî**

Darî dawiya axaftina xwe de diyar kir ku ew li ku deverê bin hewce ye em li çanda xwe xwedî derkevin û wiha got: "Em di wê hêviyê de ne ku em li ku derê bin divê xwedî li çanda xwe ya resen derkevin. Em bikaribin şoreşa hunerê di nava şoreşê de pêk bînin. Em dixwazin şoreşa gelan bi hunera gelan pênase bikin. Ev yek erka me ye. Hunermendên ku dibêjin em serbixwe ne rastiyeke wiha nîne. Mirov ji resentiya xwe nikare serbixwe be. Em vê berhemê ji niha ve pîroz dikin. Û ne tenê ev berhema hunerî hîn amadekariyên me dê ji bo projeyên din û dewlemendtir hebin."






## Lêkolîneke têkildarî pirtûkên Helîm Yûsiv

Bi sernavê "Sûretê Piştê, barê mêtîngeriyê di anatomiya edebî ya Helîm Yûsiv de" pirtûkeke lêkolînî hat amadekirin. Pirtûka ku Ferzan Şêr nivîsiye ji Weşanxaneya Peywendê derket.

Ferzan Şêr fîzyoterapist, helbestvan, rexnegir, akademîsyen û wergêr e. Bi navê Otopsiya Berbejnekê pirtûkeke wî ya helbestan jî heye. Ferzan Şêr bi navê 'Sûretê Piştê barê mêtîngeriyê di anatomiya edebî ya Helîm Yûsiv de' pirtûkeke lêkolînî amade kir.

Pirtûka ku ji Weşanxaneya Peywendê hat derxistin berê xwînerên xwe dide mijareke girîng. Pirtûk ji 134 rûpelan pêk tê.

Akademîsyen Şêr dema li ser wêjeya Helîm Yûsiv mijara xwe wekî "pişt" diyar kiriye, berê xwe daye pirtûkên wî û zêdetir bi ser çîroka "Mîrî Ranazin" û romanên wî "Sobarto" û "Tirsa Bê Diran" re mesele domandiye.

Di naveroka pirtûkê de bi sernavên wek 'Di vegotina efsûnî ya Helîm Yûsiv de Sûretên Bedenê', 'Ax pişta min: Darê piştê di deqên Helîm Yûsiv de', 'Hest(îy)ê zimên', 'Şikandina Darê Pişta Hukmê' de Ferzan Şêr mijar girtine dest. ***WAN***



Samî Hêzil

## Şahkareke epîk-fantaziyê; Hobbît

Fantazî cureyeke wêjeyê ye ku hêmanên biefsûn û dersirûştî dihewîne. Şûnwarê berhemên fantastîk piranî cîhaneke xeyalî ye. Epîk fantazî di hawirdoreke biefsûn de saz dibe. Cîhana berhemên fantastîk xwedî qanûnên xwe, xwedî afirîde, hebûn û nijadên xweserê xwe ye. Çîroksaziya wan berheman piranî bi qeder/serpêhatiya lehengekî ve girêdayî ye. Fantazî gelek jêrcureyan digire nav xwe. Realîzma efsûnî, serpêhatiyên şûr û sêrbaziyan, fantaziya tarî, fabl û çîrokên periyan jî jêrcureyên fantaziyê ne. Fantaziya nûjen di sedsala 19'an de dest pê dike. Beriya wê romans û çîrokên fantastîk hebûn ku hêmanên fantastîk ên tê de wek tiştên rast dihatin pejirandin. Dijberiya başî û xirabiyê, serpêhatiya lehengî ya ji bo bidestxistina tiştekê (wek hêz, zanyarî), kevneşopî û guherîn, nakokiya takekes û civakê, têkiliya mirov û xwezayê, îxanet û evîn temayên sereke yên berhemên fantastîk in.

Tişta ku fantaziyê ji cureyên din vediqetîne cudabûna wê ya ji rastiyê ye. Çîrokên fantastîk dibe ku qala rewşa mirovan a rasteqîn jî bikin, lê ew vê yekê bi navgînên bisêr, bi hebûna kesayetekî bijartî, bi xasyetên mîtolojîk, bi îmajên serdema navîn ên jinûvehizirkirî û bi cîhaneke nip û nû, bi hebûn û afirîdeyên cihê saz dikin. Du taybetiyên sereke yên fantaziyê hene: Yek, fantazî sêrê dihewîne. Di fantaziyê de derve wek metafora hundir e. Bûyerên ku li derve diqewimin hema bêje vejena hundirê lehengan e, pêkhatinên derve karîzmaya lehengan û hêza hundirê wan dide kifşê. Du, fantazî piranî alegorîk in, an ku beramberî têgehekê tên. Vêca fantazî bi rêya şexsîkirinê, bi rêya nîşandana hêza hundir a bi karakter û bûyerên derve wê alegoriyê kar dar dike.

Epîk wek çîrokên dirêj û kompleks di heyama Yewnanên Antîkîteyê de wek stûnên çanda demê bûn. Di civakê de tîmî dihatin dubarekirin, bi devkî dihatin parastin. Epîk bi pirsên herî girîng ên ji bo mirovahiyê re eleqedar dibe. Fantazî dema ku li cîhaneke deredetî wek çîroksaziyeke kemilî derdikeve pêş me û bi şert û mercên lehengî dixemile, bi vî awayî jî wek cureya epîk-fantazî teşe digire. Peyva epîk giraniyekê, qimeteke bilind dide fantaziyê û asta çîrokê ya dramatîk bilind dike. Çîroka epîk-fantastîk mecbûr e dirêj be. Lewre ew çîrok cîhana heyî (bi îmaja dinyayeke din) rave dike û guherîna jiyanê nîşan dide. Ji bo vê yekê jî divê dîmeneke berfireh a cîhanê û jiyanê raxîne pêş çavên guhdaran. Lewma bi sedan nav û kesayet tê de hene, qetmanên çîrokê zêde ne û domana bûyeran bi sedan sal dikişîne. Dîsa jî tişta ku xasyeta esasî ya epîk fantaziyê ava dike ne dirêjî ye. Qîmeta berhema epîk-fantaziyê peyama çîrokê ya giyanî/spîrîtûel e.

Hobbît, pêş-pirtûka sêbareya Mîrên Gustîlan a J.R.R. Tolkien, mişt bi elementên fantastîk dagirtî ye. Cîhaneke dersirûştî û tijî nependî, afirîde û giyanewerên cuda yên wek Gandalfê sêrbaz, Elf, Goblîn, Ork, Cûce, afirîdeyên şiklguhêz ên nîvmirov û nîvhirç (Beorn), Gollumê lenetiyê gustîlê û êxsîrê hêzê, dêw, teyr, balinde û gur, xezalên ku difirin û dawiya dawî jî Ejdehar Smaug tev di çîrokê de cih digirin. Her yek ji wan xwedî erkekê ye di çîroksaziya berhemê de û gelek şîroveyên sembolîk dikarin der barên wan de bên kirin. Her wisa ew giyanewer xwedî xasyetên folklorîk in jî an ku ne tenê di hişê Tolkien de çêbûne.

Her çi serpêhatiya Bîlbo Baggîns e, ev li gor çerxa lehengê destanî pêk tê. Bi gaziya serpêhatiyê, bi dudilî be jî, bi rê dikeve. Bi rastî jî ji bo dudilîya leheng a destpêkê rewşa Bîlbo û hestên wî pir bi hostatî hatiye nîşandan. Bîlbo derbasî cîhaneke deredetî dibe bi Thorîn û hevalbendên wî yên cûce re. Ew alîkariya dersirûştî (ne yek carê bes gelek caran ji Gandalf, Elrondê Elf, Balindeyan) werdigirin, ji dergehan derbas dibin, rastî ceribandinên dijwar tên û axiriyê jî hem cinawir tê kuştin, hem xezîneyan bidest dixin û hem jî gustîlê û pişt re jî kevirê Arkenê peyda dikin. Tişta herî girîng ew e ku Bîlbo sefera xwe ya lehengî bi awayekî bazneyî, bi guherînên derûnî û bi tîmamkirina peywîra xwe ya li cîhanê pêk tîne.

Hobbît epîk û fantaziyê bi xasyeta serpêhatiya lehengê xwe nêzîkî hev dike. Hobbîtên ku di dawiyê de dinyayê rizgar dikin, li destpêkê naxwazin ji mala xwe derbikevin û beşdarî serpêhatiyekê bin. Bes di nav herikîna bûyeran de diguherin û xwe bêtir dinasin. Ew tişt jî bi bûyer û elementên fantastîk çêdibin. Gelo dibe Tolkîen Hobbît wek sembola gelê îngilîz fikirî be. Bi hin awayan dişibin îngilîzan jî. Bîlbo wek xalanên xwe Took'an ji macerayan hez dike, an ku wek îngilîzên deryager û maceraperest, hêla wî ya Baggîns jî ku rehetiya malê nade bi çi tiştî û ji bo hebûnên xwe pir tîmah e, rengê muhafazekarên îngilîz dide. Her wisa nakokiya ku Hobbît biçûk in û dinya mezin e, wek îroniya ku îngilîz mezin in û dinya biçûk e dikare bê şîrovekirin.

Hobbîtên pincilîsk ên hûrik û bêhêz û heta tirsonek çawa diguherin, dibin leheng û cîhanê rizgar dikin, xirabiyê bi safiya dilê xwe û bi bextê xwe yê çê û dilê xwe yê saf dehf didin? Çawa bi bidestxistina hêz û zengîniyê, qudreta hêzê û zengîniyê pûç dikin? Hobbît û Cûce wek nijad/gel ji desthilatiya bêpar in. Hobbît di nav aramiyê de dijîn û haya wan bi teşqeleyên derve tune. Cûce jî ji desthilatiya xwe û warê xwe yê qedîm hatine dûrxistin ji hêla ejdehar Smaug ve. Hevkariya hobbît û cûceyan hêjayî şîroveyên kûr e ji bo nîqaşên têkildarî arîşeya desthilatiyê. Serkeftina Bîlbo û cûceyan serkeftineke hêja ye. Nexşe li serê Hobbîtên îroyîn û cûceyên li rojhilata navîn.

xwebûn


31 Gulan-6 Hezîran 2021 / e-mail: rojname@xwebun.org / Buha: 5 TL Hejmar: 76

*İmera Basın Adına İmtiyaz Sahibi:* Kadri Esen
*Sorumlu Yazıişleri Müdürü:* Elif Can Alkan
*Yayın Danışma Kurulu:* Abdulla Peşêw, Ehmed Huseynî, Kakşar Oremar, Prof. Knyaz Îbrahîm Mîrzoyev, Selîm Temo, Dr. Zerdeşt Haco
*Yayın Türü:* Haftalık Yaygın Süreli
*Yönetim Yeri:* Kooperatifler Mahallesi Cahit Sıtkı Tarancı Sokak İstanbul Apartmanı No: 18/6 *Yenişehir / Diyarbakır*
*Baskı:* Diyarbakır Yenigün Matbaacılık Selahattin Eyyubi Mah. Turgut Özal Bulvarı, Batıkent Yapı Koop. A/4 Blok Altı *Bağlar / Diyarbakır*

*Her nivîskar ji nivîsa xwe berpirsiyar e.*

Ji bo abonetiyê
Tel:0 (541) 806 84 85

# Strana ku xwedîka rewşa serdema xwe ye!



Kakşar Oremar

Strana Lêkir di salên 1980-88'an dema ku li başûrê Kurdistanê siyaseta Ta´rîb û Enfalê hebû hatiye gotin ku peyamên tijehêvî di nava xelkê da belav dike. Çend tabloyên wê stranê hene ku tije xwezî, daxwaz û hêviyên mezin in

Stranek û peyamên tê de ÎtÎbara huner û sewiya têgihiştina hunermend baştir aşkera dikin.

Huner di nava kurdan de xwedî dîrokeke dêrîn e û di hemû warên jiyanê da peywendiyeke rasterast bi hemû çînên civakê re hebûye.

Her stranek xwedîka wê serdemê ye ku têde hatiye gotin. Berî çendekê hunermend Diyar Dêrsim ji min daxwazek kir. Wî xwest hevkariya wî bikim ku hinek gotinên strana Lêkir ku ji hêla Erdewan û Eyaz Zaxoyî ve hatiye gotin, binivîsim. Gotin û awaza stranê yên mamosta Ebdulezîz Silêman Zaxoyî (1) ne ku di salên pir dijwar yên şoreşa Kurdistanê li başûr hatiye nivîsîn û gotin. Ev stran di salên 1980-88'an dema ku li başûrê Kurdistanê siyaseta Ta´rîb û Enfalê hebû hatiye gotin ku peyamên tije hêvî di nava xelkê da belav dike. Çend tabloyên wê stranê hene ku tije xwezî, daxwaz û hêviyên mezin e. Bi xwendina helbestê re hûnê baştir merema min fam bikin ka çima vê carê min li ser peyamên stranekê ev nivîs amade kir:

***( 1 )***
***"Lêkir lêkir baranê lêkir***
***Kanî û rûbar pîrî av têkir***
***Xemla gundê(warê) me dîsa dest pê kir ayyyy***
***Xemla warê me dîsa dest pê kir***
***Sîngê yarê ji gulavê çêkir***
***Sîngê delalê ji gulavê çêkir"***

Di wan salan de şerekî giran di navbera Îran û Iraqê de hebû, lê li du aliyên başûr û rojhilatê Kurdistanê jî şer li dijî her du dewletên dagirker ji hêla partiyên weke PDK-Iraq, YNK, HDK-Îran û Komelê ve dihate meşandin.

Hêvî gelek mezin bûn ku di wan şert û mercên pêşhatî de kurd bi hevgirtineke stratejîk bigihin armancên xwe yên serxwebûn an jî mafên netewî, lê hezar mixabin di hemû dema şerê di navbera du dewletan de çend partiyên sereke ketin şerê li dijî hev. Ji hêlekê artêşa dewletên dagirker bi awayê rojane kurd dikuştin û ji hêla din jî xwekujiya kurdan berdewam bû. Derfet wenda bûn lê hunermend her demê bi hêvî bûn ku dengê şoreşê li dijî dewletên dagirker bilind bikin.

Carna şerê li dijî Baasiyên cinayetkar hest û hêvî mezin dikirin û rewşenbîrên weke **Ebdulezîz Silêman Zaxoyî, Dr Bedirxan Sindî, Segvan Ebdulhekîm, Sebrî Botanî** û hinek kesên din di çarçoveya helbestekê de ew peyamên xwe belavî nava civakê dikirin." Lêkir baranê" tê wateya destpêkirina şoreşeke nû û hatina şervanên kurd ji serê çiyayan bo nava gund û bajarên welat. Hemû peyv delaliya warê kurdan beyan dikin û mizgîniyên xweş tê de hene.

Li rojhilatê Kurdistanê jî hunermendên weke şehîd Cemal Mûftî, Nasir Rezazî, Necmedîn Xûlamî, Kalê û çend kesên din jî hebûn ku li dijî tevkujiyên bi destê rejîma Xomêynî stran û marşên xweş diafirandin.

( 2 )
Tabloyê duyê yê strana Erdewan dîsa jî nûçeyên nû têde hene:
" Çendî li min xweş tê dengê baranê
Xûrîna kewan li heyva gulanê
Ber keviyên befrê mij û moranê
Me hêlîn çêkir, lêkir baranê"

'Xweşiya dengê baranê' hêmaya dengê teqîna goleyên tifeng û 'Xûrîna kewan' jî mizgîniya çûyîna Pêşmergeyên kurd û vegera wan bo nava axa welat bûye. Şikandina bêdengiya ku bêtirî deh salan bû sîngê Kurdistanê kiribû gorepana gor û çeqelên Baasî û kurdên welatfiroş.

Ji sala1975'an ku şoreşa Îlonê rastî şikestê hatibû dewleta Iraqê bi hemû awayî dest bi siyaseta bişaftin û guherandina demografiya Kurdistanê kiribû. Bêdengî û zextên giran li her derê bandoreke gelek xerab li ser jiyan û hestên gel danîbû.

Bi dengê hunermendên weke Eyaz Zaxoyî (1961-1986) û Erdewan Zaxoyî (1957 – 1986) ew dengê şoreşê zû li her derê belav dibû. Ew du bilbilên Behdînanê bûn ku yê yekê di nava artêşa Iraqê de bû û yê duyê jî ji hêlîna xwe reviyabû, bibû pêşmerge û bi dengekî germ û aliyê xwe yê xort di warê afirandariyê de hêvîyên mezin di nava kurdên dilşikestî de belav dikirin.



Tevî hemû tirsa ku ji hovîtiyên Baasiyan hebû lê dîsa jî Eyaz û Erdewan kesên wêrek bûn. Carna bi strana: "Newroz hat û bi gul-rîhan e" û carna jî bi gotina: "Çibkim ez" ew dibûne dengê hezaran ciwanên kurd û rêya doza Kurdistanê digirtin ber xwe.

Di wan salan de rewşenbîr û hunermend xwedî yek armancî bûn û ew jî li ser pêhiştina gel û civakê bû ku hestên wan neçilmisin. Tevî hemû kêmasiyên teknîkî û zehmetiyên ku hingî hebûn kasetên Erdewan ji rojhilat digihiştin başûr û xelkê bi baldariyeke mezin guhdarî wî û hevalên din yên hunermend dikir.

( 3 )
Strana 'Lêkir lêkir baranê lêkir' ya wan salên reş û tarî ye ku êdî Enfal, Tarîb, kîmyabaran û veguhastina kurdan bi darê zorê ji cihwarê wan yê jiyanê çar rûkinên sereke yên siyaseta dewleta Sedam Husên û Baasiyên tawankar bû. Rewşenbîrên kurd bi awayekî dûrbînane dizanibûn ku ger ew siyaset bi ser bikeve êdî yê axa wan ji xelkê xwecih vala bibe. Kerkûk li ber çavên wan bû. Helepçe û Behdînan bi hemû cureyên çekan dihatin wêrankirin. Jiyana herî erzan li Kurdistanê bû. Kom bi kom kurd dihatin kuştin û wendakirin. Hingê ku Silêman Ebdulezîz tabloyê sêyê wê strana dîrokî radixe ber çavan:

***"Serê çend sala rûbar û kanî***
***Têhnîne hişkin ji bêxudanî***
***Çend mistêt têda behra biyanî***
***Em çibikin gelo gelo ji bê zêrevanî"***


Peyamên wiha hêrsa gel li dijî dagirkerên şovenîst gurtir dikir. Caş-belaşên ku di wan salên tijeagir û xwîn de destê hevkariyê didan dijminê qedera xwe jî ji hêza şoreşê ditirsiyan.


Ev stran li pey salên ku Erdewan vegeriya başûr û Iraqê di rûniştineke wî û Eyaz Zaxoyî de tevî çend kesên din hatiye gotin. Cara yekê wî bi xwe bi tenê gotiye lê piştre dema li Duhok, Bexda, Mûsil û bajarên din bûye tim ji ber daxwaza xelkê hatiye strîn. Yek ji sedemên wendakirina Erdewan Zaxoyî jî gotina stranên xwedî naverokek siyasî bûye.

Hunera kurdî ya çendsaxî garantiya hebûn û mayîna me ji destê sultanên xwînrij û dewletên dagirker bûye. Zimanê me yê dewlemend û dîroka me ya tije rûdanên xweş û nexweş bi rêya stranên me yên siyasî heya roja îro zindî maye. Hunera protestokirinê li Kurdistanê mîrateyekî giranbuha ye ku herî kêm hestên gel zindî hêlane û li dijî dagirkeran daxwaza serhildanê û berxwedanê di nava wan stranên me de heye.

Yek ji wan stranan jî 'Lêkir baranê' bû ku dikarin li vira jî bi dengê hunermendê şehîd Erdewan guhdar bikin.

https://www.youtube.com/watch?v=oUztRualraw






***Têbinî:***
***(1). Ebdulezîz Silêman Zaxoyî yek ji hunermend û nivîskarên hêja ye ku niha li Zaxo dijî û ji gelek hunermendên weke Gulbihar, Tehsîn Teha, Erdewan, Eyaz û hwd. stran û awaz danîne.***